Li Îraqê de Miletê Kurd nêzîka 28 % ji tevaya Xelkê dide biderxistin. Welatê wî pir xiznên dewlemend di nava wî de têtin bipeydakirin. Herwehaji jêre jî giranbûneke têtir bidîtin, ku ew Îraqê ji bona Dewleteke Fêderalî bide biguhertin, ku ew ji du Komaran bête bipêkhatin, yek jê bi navê Komara Îraqîyî Erebi ve û ya duwem bi navê Komara Kurdîstana Jêrî ve bête binavkirin. Û herdu Komar di nava Serdariya Fêderalî de bêtin biyekkirin, ku tede desthilatî û berên destûrî bêtin biparvekirin. Wehaji dibe, ku heremeke Xwedmoxtarî ji bona Kêmanîya Milîyî Turkumanî di nava Komara kurdîstana Jêrî de bête bidîtin.

Eger Partiyên Kurdî -û yên Erebiyên Demokrasî- bi nala vê çarekirina hanê datin bidaxwazkirin, dê ev çarekirina hanê baştir û nêzîktir ji bona demokrasîyê û tirazûkirina hêzên Milî bête bidîtin. Weha bi vî rengê ve hanê navê Îraqê, - ma ew bi xwe jî ve di koka xwe jî de pê Îraqa Erebi dihate binavkirin -, ku ew navê hanê bi xwe jî ve ji bal Impiryaliya Ingilîzî de li ser kurdîstanê de bi darê zorê ve hatîye bidanîn, dikare ji bona Komara Hevgirtîyî Erebiyî Kurdî yanji ji bona Komara Hevgirtîyî Îraqîyî Kurdî yaxud ji bona navekî din, - mîna navê Komara Çîkoslovakya Hevgirtîyî civandî ji bona navê herdu Milîbûnan û herdu Komaran ya çîkî û ya Silovakî- bête biguhertin.

Ez lêbuhurandinê ji bona nimûneya tê didim bidaxwazkirin. Tevlivêjî dê Xwendevanê Jîrdar li armanca wê de bête biagehdarkirin û di mebesta wê de bête biliberketin. Ez wê bes û bi tenha ve jiber diyarbûna wêneyê wê didim bianîn: Weha daxwazkirin ji bona herema Xwemoxtarîya rast û durust ji bona Miletê Kurdistana Îraqê bi hespekî esîl tîne bi bîrxistin, ku ew dixwaze xwe ligel bargîran de bide bitewilandin: yanî ew cihekî li gora xwe de ji xwe re nade bixwestin.

Ez bi xwe ve peyvê derbarê durujmê demokrasî ji bona Îranê û xwedmoxtarî ji bona Kurdistanê nadim bidirêjkirin. Ew bi xwe jî ve jiber sebebên pir, yên ku hinek ji wan bi rengekî giştî ve li jor de hatine bidîtin, nade bitêrkirin. Û hinên din ji wan sebebên ligel hebûna Milîbûnên pirî ne kurdî û ne jî Farisî di nava hundurê Dewleta Îranê de nayên bilihevkirin. Rastir bû, ku daxwaz bi Komareke Îranîyî Fêderalîyî Demokrasî ve bihata bikirin, ku têde Milîbûnên cuda di nava Komarên Hêvgirtîyî Milî de, yanjî Heremên Xwedmoxtarî de li gora giringbûna wan de û ji wan jî Komara Kurdistan yanjî Komara Kurdistana rojhilat xwe bide biyekkirin. Di vî babetê hanê jî de Loristan dikare bi heremeke Xwedmoxtarî di nava Komara Kurdistanê de bête bidîtin; jiber ku Lor di warê ziman, mêtû û ciyografî de bi kurd ve têtin biderkevtin.

Pêncem. Weha Çarekirina Fêderalîyî Demokrasî bi xwe ji bona pirsîyarîya welatî li Îran û Îraqê de, pêrejî ligeljî de çarekirina girêdayî bi pêkanîna Xwedmoxtarîya Rast û Durust jî ve ew nikare bide biçarekirin, - ger me jî ji bona gift û gokirinê jî bikarina bicihanîna wê date bidanîn,

pirsiyarîya welatîyî Kurdî, ya ku mîna pirsîyarîyeke welatîyî bi serê xwe ve tête biderkevtin.

Ger jî em nimûna Îraqê ji xwe re bidin biwergirtin, dê emê bibînin, ku Miletê Erebi li Îraqê de bi zikmakî ve dilê wî ji bona bicihanîna renekî ji yekîtîya siyasî ligel Miletên din de ji Netewê Erebi tête bibijandin. Û ne weke ji hin dîtina û biryareyan, mîna ku ew hin caran ji bal Partîya Komonista Îraqê de dihatin biraxistandin, li ser Miletê Kurdistana Îraqê de têtin biderkevtin, ku ew li piş Miletê Erebi Îraqê de di çûna xwe de ji bona her yekîtîya Erebi yanjî hev girtina Erebi de - ji bil hestkirina pişt girtinê û dirawesebûnê di navbera herdu Netewan de - bête meşandin. Jiber ku Miletê Kurd li Îraqê de nala her perçeyekî din ji Netewê Kurd, yê ku ji bal Impiryalîyê de hatîye bisizadankirin, bi zikmakî ve ji bona yekîtîya siyasîyî vî Netewî dilê xwe dide bibijandin.

Na hêjbêtir rizgarîkirin û yekîtîkirina Netewê Kurd bêtir bi pêwîstir ve û bi leztir û daxwaztir ve ji rizgarîkirin û yekîtîkirina Netewê Erebi tête bidîtin; jiber Netewê Erebi Miletên wî serbixwe di nava Dewletên xwe de têtin bijîyandin û hîç metirsîyek ne li ser hebûna wan de û ne jî li ser ferhenga wanî rehî de mîna metirsîyên nabûdkirinê tête bidîtin, yê ku hebûna Netewê Kurd ber bi mertîsiyê ve didin bixistin û wî ji rizgarkirina wî û pêşketina wî didin biber girtin.

Weha pê hestkirina tevaya Zaroyên Kurdistana perçekirî bi yekîtîya Netewê xwe û pêwîstîya azadkirina wî, yekkirina wî û rizgarîkirina wî ji Kolonyalîyê ev bi xwe ve pêwîst bi dirêjîyê li ser de nayête bidîtin; Jiber bi

xwe ve evaya pir bi diyare ve têtê biderkevtin û pê jî û ji bona wê jî tevaya çîniyên Kurdî û hemû êdyolociyên li Kurdistanê de peydakirî çî ji Borcuwazîya Bajarî tanî Kargeran, Cotkaran, Rewşenbîran û Destkaran - ji bil gemara hevkarîrî ligel çîniyên Desthilatîyî Milîbûnên Mezin û Impiryalîyê de didin biarmanckirin. Ev gemara hevkarîrî jî bi xwe jî ve bi karekî Serûştî ve têtê biderkevtin, ku jê bez niye û ew bi xwe jî ve bi diyareke Kilasîkî ve têtê biderkevtin, ku em wê li nik hemû rengên Kolonyalîyê de didin bidîtin. Tevlivêjî bi xwe jî ve dê ew nikaribe mûyekî li ser rastîya hebûna Netewê Kurd û dilbijandina wî de di rizgarîkirinê û yekîtîyê de bide bikêrkirin.

Lêbelê hêjbêtir çîniyên bi desthilatî ve li nik Milîbûnên Mezinî Dirawese de, yên ku ji bal wan Kurdistan têtê bikolonyalîkirin, ew bi xwe ve dana her Xwedmoxtarîyeke rast û durust didin binayînkirin. Wehajî bi xwe jî ve hêjî jiber xwe jî têtê bidiyarkirin, ku ew her çarekirineke Fêderalî didin binayînkirin; jiber ew bi rast û durustî ve li ser dilbijandin û hêviyên Gelê Kurd de ji bona bi dawîanîna rizgarkirina xwe û yekkirina Welatê xweyî Kurdistanê ve têtin biagehdarîkirin.

Weha Borcuwazîya Turkîyî bi Desthilatî ve û pêrejî bi yarmetîya Impiryalîya Cîhanî jê re jî derkirina rojnameyeke Kurdî jî bi xwe jî ve rê pê nade bidan. Wehajî gerjî Miletê Kurd ji bona yekîtîyê ligel Miletê Ereb de li Îraq û Suryê de, ligel Miletê Turk di Komara Turkî de û ligel Miletê Faris û Miletên din de li Îranê de bête bibangkirin. Ma gelo çawa dikare bête bîkirin, ku mafeyê wî ji bona yekîtîya wî ligel xwe de û hilanîna sînoren

çêkirî bête binayînîkirin, yê ku wan bask û perên Kurdistanê ji hev dane biçirandin û guhertinên bazirganî di bazara abûrîyê hundurê de ji bona vî Welatê hanê dane biberbendkirin, ku Kurd weha bi revandina mal ve dane bineçarkirin?

Belê ji mafeyê Kurda tete biderkevtin, ku ew xwe bi xwe ve di nava hev de bidin biyekkirin, berî ku ew ligel Miletên dorhêla xwe de bibin biyekkirin, gerjî çendjî dostanî ligel wan jî de bi şêrînî jî ve bête bidîtin, gerjî çendjî giringbûna berjewendîyên hevbeşî jî ligel wan jî de bête bidîtin. Berjewendîya Gelê Kurdîyê bilind bi dawîanîna Kolonyalîkirina wî ve û bi azadîkirin û bi yekkirina vî Netewê hanê ve dide bizordarîkirin. Ev berjewendîya welatîyê bilind bi xwe ve ew di ser hemû berjewendîyên hevbeşî re tete bigirtin. Jiber berjewendîya hevbeşî dikare bête biparastin, na hêjbêtir bi rengên din ve ew bi xwe jî ve dikare bête bipêşvexistin. Ew bi xwe ve perçekirina Kurdistanê, dagîrkirina wêyê leşkerî, talankirina xêr û bêrên wê û nehiştina Gelê Kurd dide bipêwistkirin, da ew xwe bi xwe ve bi destikên têrkirî abûrîya welatê xwe bide bipêşvexistin, endazê berzbûna jîyana xwe nemaze endazê Jîyana Çînîyên Xebatkêş bide bilindkirin û Ferhenga xwe bide bipêşvexistin û bigeşkirin.

Şeşem. Weha mîna li jor de hatîye bidan, ku nîşankirina armancên Kurdan li ser wergirtina "Xwedmoxatîriyê" de weha beşkirina tevgera Kurdî ji bona perçan dane bikirin û her perçeyekî jê ji bona çend Partîyan hatîye biperçekirin, ku ew bi pîrbûn ve di nava xwe de xwe bi xwe ve bi pêxîlên hevdû ve têtin bikevtin. Weha û bi renekî taybetî ve û jiber cenga di navbera Îraq û Îranê de hatîye

bivêkevtin, Partîyên Kurdîyên têkoşer li Kurdistana Îranê de, bi xwe ve xwestin yanî nexwestin, na hêjbêtir di ser Vîna wan re jî de hate bidîtin, xwe bi xwe ve di zîneteke "hevalbendekî durust" de di taktîka xwe de ligel Diktatorîya Serdarîya li Îraqê de bidin bidîtin!

Wehajî ligel vê jî de Partîyên Kurdîyên têkoşer li Kurdistana Îraqê jî de, bi xwe ve xwestin yanî nexwestin, xwe bi xwe ve di zîneteke "hevalbendekî durust" de di taktîka xwe de ligel Diktatorîya Serdarîya li Îranê de, yan jî bi kêmanî ligel wan Serdarîyên din de, yên ku ew Tehranê mîna Serdarîya Surî lê didin bipîştgirtin, li gora mêldarîyên van Partîyan de xwe datin bidîtin. Weha ji vê zînetê hanê û jiber hoyên mêjûyîyî nuh rewşek wisa hate bipeydakirin, ku li vê derê de pêwîst niye, em li ser de bidin bipeyvînkirin.

Wisa di vê rewşa hanê de şerên xunavîyî pir tal di navbera hin ji van Partîyên hanê de hate bikirin, ku wan bi xwe ve ew dane biqelskirin û hêjbêtir wan metirsîyên li ser wî de dane bipirkirin, yên ku Gelê Kurd bi tevayî ve û tevgera azadîxwazîya wî ber bi tirsê ve dane bixistin.

Werjî ez naxwazim, bi "dirêjî" ve di nava wan metirsîyên hanê de bêtim bikevtin. Nejî ez dixwazim, ku wan Partîyên hanê jî, yên ku wan ligel hev dane bişerkirin, bidim binavkirin. Nejî ez dixwazim, ku berpirsiyarîyê bi ser hustuwê yekê ji wan ve bidim biavêtin - Evaya jî bes û bi tenha jî ve jiber parastina berjewendîya giştî tete bikirin û ji bona ji nuh ve di navbera wanên ligel hevdû de didin pevdiçûnkirin, hajbûn û hevkarî di nava wan de bête bicihanîn. Evaya jî wisajî mîna ku pir ji Kesên Xêrxwazên

Zaroyên Miletê me û dostên wî jî didin bikirin. Wetov bes û bi tenha ve mêjû dikare bide bigirawkirin, ku ew berpirsiyarîyê bide bironîkirin.

Xwezî jî bi zû jî ve hajbûna daxwazkirî bête bicihanîn. Lêbelê jî divê jî bête bigotin, her Partîyeke ku ew ji bona Xwedmoxtarîyê û Demokrasîyê di nava sînorê Dewleta xwe de dide bixebatkirin, ya ku ew têde tête bidîtin, bes û bi tenha ve divê li ser wê de ku ew xebata xwe di nava sînorên wê Dewleta hanê de li ser bide bigirêdan.

Bi hîç renekî na be bête bikirin, ku ew destdirêjîyê ji bona nava Kurdên Dewleta dorhêla xwe bide bikirin, yanjî ji bona xebata wan di herema wan de, ya ku bi xwe jî xwedanê wan armancan jî bi xwe ye, ber li ber de bide bigirtin. Mexabin, ku bi vênajî ve yek ji hêzên welatîyî Îraqî jî dijî tevgera Xwedmoxtarîyî Kurdî li Îranê pê tête birabûn.

Hêjbêtir ji van tevan jî dibe, ku mîna van pevçûnên hanê jî nikaribin rêya xwe di nava tevgera azadîxwazîyî Kurdîyî Giştî de bide bidîtin; jiber ku ew bi xwe jî ve û serûştîya wê jî bi xwe jî ve rêzên welatîyî demokrasî bi ser hevdû ve dide bicivandin. Herwehajî pêrejî ew nexweşîyên di nava wan Dewletan de, yên ku wan Kurdistan di nava xwe de dane bidabeşkirin, nala dijûnan didin bidîtin, ku ew nabe, xwe di nava wan de bide bixistin. Na hêjbêtir divê ew xwe ji wan hêjî bilindtir bide bidîtin û wan di wî endazê wan de bide bihiştin; jiber endazê pevçûna wan bi xwe ve nala endazê pevçûna nava gurên Diktatorîyê tête bidîtin, ku pêre pir cudabûn di navbera wêna de û endazê rizgarîkirina welatî de tête bidîtin.

Wehajî li ser berê Cîhanî jî yanjî Dewlî jî van pevçûnên hanê jî di nava van Partîyên hanê jî de datin bigihandin, ku weha li tevgera Kurdî de bi dilqurufandî û payebûn, yanjî bê guhpêdan û di bin baştirîn rewşê de bi hinhekî ji dilovanîyê ji bona vî Miletê sergêjkirî di nava dijbûnên xweyî siyasî û pevçûnên xwe de lê bête bimeyzekekin. Erê ji bona tevgera Kurdî li nik Dewletan de û di berê Dewlî de ne jê re kêrek û ne jî giranbûnek tete bidîtin, tevî ku pir gorî jî têtin bidan û xebateke mezin jî tete bikin. Belê Ev Miletê hanî qehreman nestêleye, ku ev tev de bi serê wî ve bêtin bikin. Gerjî bête bikin, ku yekekê ji van Partîyên Kurdî hinek ji navdengîyê û bextewerîyê li nik hinek Dewletên Biyanî de date biwergirtin. ev kar û baraya jî bi xwe jî ve ji dîtineke berjewendîyî bi serêxwe jî ve tete biderketin, ew ne ji dadwerîya xebata vê Partîya hanê û dadwerîya pirsîyarîya Kurdî û ji giringbûna wê bi xwe jî ve tete biderketin.

Weha Gelê Felestînîyî Erebiyî têkoşer ew bi tenha xwe ve di herema rojhilata navîn de tete bidîtin, yê ku zorlêkirina wî û bêparkirina wî ji Dewleteke Milî bi xwe ve ew jî nala zorlêkirin û bêparkirina Gelê Kurd tete biberamberkin. Wehajî dibe, ku zîneta wîyî Milî hêjbêtir ji zîneta Kurdî jî bedtir bête bidîtin. Weha Sehyonistîyê û Impiryalîyê piranîya Zaroyên wî ji diyarên wan ji hev dane bibelawelakirin. Tevlivêjî nerîna biryareya Giştîyî Ewropî û Cîhanî jî ji bona pirsîyarîya wî û piştgirtina wêyî her bêtir ji bona wê ew bi xwe jî ve ligel dadwerîya wê jî de, nemaze ligel rastîya raxistina wê de nala pirsîyarîyeke rizgarî û welatî tete bilihevkin.

Weha li vê derê de cudabûneke bingehî di navbera pirsîyarîya Felestînî, ya ku ew ber bi çarekirinê ve tête biçûyîn -ger Impiryalîyê xwest yanjî nexwest- û pirsîyarîya Kurdî de tête bidîtin. Weha Gelê Felestînîyî têkoşer li pêşîya Gelê Kurd de di nîşankirina armancên xwe de bi carekê vê bi bê pêç û penakirin ve û bi bê lewçekirin ve daye bixistin. Ew jî di rizgarîkirina wîyî welatîyî giştî de tête bidîtin û di afirandina dam û destgehê siyasî û sipahî de ji bona civandina rêzên wî û ji bona rêxistinên wîyî pêwîst ji bona xebata wî tête bidîtin. Ew jî rêxistina rizgarkirina Felestîne. Weha tevgera Felestînî bi vê yeka hanê ve wê dikarî bû, -û jiber piştgirtina piranîya Dewletên Erebi, yên Islamî û yên Sosyalistî ji bona wêna-dengê xwe di nava berên Dewletan de bide bilindkirin û wî bi Mîrîtî -Resmî- di nava Yekgirtina Netewan de bide bibihîstin.

Weha hêjî Miletê Kurd bi xwe ve wisa maye, bêyî ku ew ji bal civandinekê bi serhev ve bête bicivandin, neji dam û destgehekî wîyî siyasî jê re tête bidîtin, ku ew rêz û rêxistinên wî ligel hevdû de bide biyekkirin û şeweyî xebata wî jê re bide binîşankirin. Weha hêjî Partîyên wîyî cuda û her yek jî bi serêxwe ve ji xwe re dide bikarkirin, ku ew pirsîyarîya wî nala Komekê ji pirsîyarîyên hundurûyî -Pirsîyarîyên Xwedmoxtarîyê û Demokrasîyê di nava wan Dewletên hanê de yên bi navkirî dide biderxistin- li gora Dewletên ku Kurdistan di nava xwe de dane bidabeşkirin.

Weha jêre kes ne lê guhdarîyê û guhpêdanîyê pê dide bikirin. Belê weha bi vî rengî ve me xwe bi xwe ve û bi kurtî ve Partîyên me li ser daxwaza wan bi Demokrasîyê û

Xwedmoxtariyê ve di nava Dewletên Kolonyalîkirinên Kurdistan de dergehên Berên Dewlî li ber xwe de dane bidadan û me xwe ji karîna berzkirina dengê Miletê xweyî xebatvan di nava Yekgirtina Netewan de date bibêparkirin.

Careke din Miletê Felestînî nala hespekî kihêl hêdî hêdî li ser xwe de dide bibe zandin, da ew xwe bi mêrgên azadîyên hespên kihêl ve bide bigihandin.

Weha jî Miletê Kurd nala hespekî kihêl tete bidîtin, ku ew hêjî pê bi pê li dû bargîran dide biteptekirin.

Belê xuwarbûn ji Suwarê wî tete bidîtin; jiber ku ew pir pirin û hêjîbêtir ew di nava xwe jî de ji bona suwarbûna wî ligel hevdû de didin pevçûnkirinn. Hespê kihêl bi kêmî Suwarekî ve bi tenha xwe ve tete biderkevtin, ku ew li ber wî de dikare bête biliberkevtin û wehajî nala wî jî ew jî bi kihêl ve bête biderkevtin. Gerjî ew jî bi suwarbûnê ve li ser de pir bi biderengî ve bête bixistin, wehajî hêjîbêtir ew jî kêmî Suwarekî pir şût û kone di suwarbûnê de tete biderkevtin.

Weha pêwistî pê niye, ku li vir de bête bigotin, ku suwarbûna mebestkirî ne suwarbûna sedsalên navîn tete bimebestkirin, na hêjîbêtir ew bi xwe suwarbûna sedsalên bîstan tete bimebestkirin, ku ew ne bes tenê li ser mêrxasîyê de tete bigirêdankirin, lêbelê jî ew bi xwe jî ve hêjîbêtir jîrbûnê, hunermendîyê û vejandinê dide bipêwistîkirin.

Weha ez ji Xwendevanê xwe lêbuhurandinê dixwazim; jiber ku ez ji erkê li ser xwe de dibînim, nîşanekê li ser wan Peyvan de, yên ku ew di salên 1964 - 1966 de û di

pişt re jî di 1974-1975 de hatin bikirin, jiber giringbûna navroka wan bidim bidan.

Weha di nava wan salan de çend caran min Rêberîya Partîya Komonistî Italî û Rêberîya Partîya Sosyalistîyî Italî date biserdanîkirin. Wisa ez ji bal Berpirsiyarên Beşê Pêwediyên Derve dihatim bipêşewazîkirin; jiber ku ez bi xwe him Wêner û Cîgerê Şûreşa Kurdistana Îraqê dibin Rêberîya Partîya Demokratî Kurdistanî de û di bin Serokîtiya Mustefa Berzanîyî Qenc de bûm. Min ji herdu Partîyan alîkarîya wan ji bona xebata Gelê Kurdistana Îraqê û şûreşa wî date bixwestin. Bersiva her yekê ji wan bi serêxwe ve û di her carekê de yekbû: "Hûn ji bona Xwedmoxtarîyê di nava sînorên Îraqê de didin bidaxwazkirin, weha evaya dide biderxistin, ku pirsîyarîya we, mîna ku hûn wê didin biraxistin, ew bi xwe ve pirsîyarîyeke Îraqîyî hundurê ye û ji bona me di rastîya rastî de hîç mafeyê destdirêjîyê têde niye. Lêbelê Gelê Kurd ew bi xwe Neteweyeke û jêre mafeyê Çarenûs mîna her Neteweyekî din heye û li ser vê de hîç pêwist bi gift û goyê niye. Lêbelê ger hatebi kirin, ku tevgera kurdî bi xwe ve date bibiryarkirin, ku ew pirsîyarîya Gelê Kurd mîna pirsîyarîya Neteweyekî bide biraxistin, ku ew ji bona rizgarkirina welatî û bi karanîna mafeyê xwe ve di Çarenûs de bi xwe ve dide bixebatkirin, wê hingavê dê ji erkê Partîya me bête bidîtin, ku ew alîkarîya xebata Gelê Kurd ji bona rizgarkirina welatî û ji bona pêrabûna mafeyê xwe di Çarenûsa xwe de bi xwe ve bide bikirin"

6. Kurd û Mafeyê Çarenûs, Demokrasî û Miletên dorhêlê:

Weha Partîya Tûrkiyî Komonist T K P Turkeyi Komunist Partisi û ne "Partîya Komonistê Turkî" tête binavkirin. -Ev Partîya hanê di nava xwe de û di nava van salên dawî de ji bona çend perçên berberkirî na hêjbêtir pevçûnkirî hate biparçekirin. Ê yekek ji giringtirîn sebebên parçebûna wan neykbûna wan li ser pirsîyarîya Kurdîyî welatî de bû. Weha ji giringtirîn perçe ji van perçan di warê "Êdyolocî" de tête bidîtin, ya ku bi xwe rojnameya navînî Isçinin Sesi bi zimanê Turkî ve yanî Dengê Kargeran dide biderxistin û wî Partîyeke Komonistî nuh di bin navê -T.K.P.- yî berê de bi pêvekirina "Lênîni" pêve, yanî Berê Dengê Kargeran date bipeydakirin. Ew bi xwe ve hêrîşê ji bona rêberîya kevin dide bikirin, dibe, ya ku hêj li ser serê perçeyekî de ji Partî dimîne û navê berê dide bihilgirtin, ew wê jiber sebebên cuda û giringtir ji wan rawestandina wê beramber bi pirsîyarîya Kurdî ve bi kêspereştîyê ve dide bisûcdarîkirin.

Weha T. K. P.- ya "Lênîni" yanî Berê Dengê Kargeran bi xwe ve ew Berê pêşî bû, yê ku di Partîya Komonistîyî

Mîrî de bi hebûna Netewê Kurd li Kurdistana Turkî û bi mafeyê wîyî Çarenûsê û pêrejî yê Cihêbûnê jî de pê hate birûniştin -, tevî ku ew jî ji bona yekbûna xebata pirolitarîya Turkî û ya Kurdî ji bona wergerandina Rêstika Serdarîyê û bi cihanîna Şûreşa Sosyalistîyê û di dawîya dawî jî de dida bibangkirin, da ku mafeyê Çarenûsê ji bal Miletê Kurd de bête bikaranîn.

Tevlivêjî wê jî di rojnameya xweyî navînî de di Dengê Kargeran de di sala 1980 de gotareke dûr û dirêj date binivîsandin, ku ew wê têde li ser mafeyê Netewê Kurd de bi giştî ve û ne bes tenê li Kurdistana Turkî de ji bona Çarenûsa wî û bi azadî ve date bitakîdkirin, bêyî ku ew hîç nîşanê ji bona ser pêwistîya Yekbûna Pirolitarîya Kurd û Turkî û bi serketina Şûreşa Markisî ve bide bikin, da ew vî mafeyê hanê ji xwe re bîne bikaranîn. - Evaya bi xwe ve ligel dîtina min de û herwehaji ligel biryareyên Lênî de nayête bilihevkin-. Min bi xwe ve ji bona bangkirina hevkarîyê di navbera rizgarîkirina Kurd û Çepê Turkî de ji bona xistina Rêstika Sipahîyî Faşî date bitêrkirin, ya ku ji bal Ceneral Êvirin di wê salê de hate biserdarkirin²².

Belê wan çar carên din belavkirina vê gotarê di nava Çapemeniyên xweyî cuda de bi zimanê Turkî û Ingilîzî ve datin bibelavkirin²³. Weha Sulêman Sikalî Endamê Polîtîbîrowa Partîya -T K P- ya Lênî ango Berê Dengê Kargeran di nivîsta xwe de dibêje, ya ku ew di sala 1980

²²Isçinin Sesi. N. 132 London. 7 July 1980

²³Ev gotara hanê bi ingilîzî ve di kovara Turkey Today de Jimara Yulî- Awgost sala 1980 de, R. 21 tanî 26 de hate bibelavkirin.

bi Turkî ve di bin navê "Gotar li ser Kurdan de" hate bibelavkirin. Weha navê wê bi xwe ve navroka wê dide biderxistin. Ew yên tên dibêje²⁴: "

Weha zordarîlêkirin Netewê Kurd ew bi xwe ve ne bes tenê ji bona Kurdistanê bi azardanî ve tête biderkevtin, lêbelê jî ew bi xwe jî ve ji bona Kargerên Turkan jî bi azardanî ve tête biderkevtin; jiber hebûna Neteweyekî Zordarîlêkirin ji bal Neteweyekî din her û her duberîyê di navbera Pirolitarîya herdu Netewan de dide bipaydakirin" R. 77 ji nivîstokê. Ew hêjê dibêje:

"1. Xebata Miletê Kurd dijî Zordarîlêkirina Milî û xebata Pirolitarîya Turkî dijî Impiryalîyê û dijî Çînîyên ligel hevkar divên ew xwe di xebateke yekane de bidin biyekkirin, ne bes tenê ku ew bi peyvê ve lêbelêjî ew bi bikar jî ve bêtin biyekkirin. Wehajî divê li ser me de bi xebata me ve bête bipêwistkirin, ku em bi rastî ve ji bona sitendina mafeyê Miletê Kurd didin bikarkirin.

2. Da ku em bikaribin Rêxistinên Pirolitarîya Kurdî û Turkî bidin biyekkirin, divê li ser me de ku em bi mafeyên Miletê Kurd ve û pêrejî têde bi mafeyê wî ve di

²⁴Evaya nivîsteke di 182 rûpelan bi zimanê turkî ye. Gotara bi navkirî ve careke din di rexên rûpelên 22 û 23 de hatiye bibelavkirin. Suleyman Sakali, Kurt Surunu Yazilar, Isçnin Sesî Yayinlari 15, London, Yuli 1980

Cihêbûnê de pê bêtin birûniştin. Herwehaji li ser me de tete biditin, ku em Pirolitariya Turkî bi vî canê hanê ve, bi canê hevpiştgirtina Navnetewî ve bidin biperwerdekin. Wisa heger em di vê yekkirina xebata hanê de neyêtin biserkevtin, dê Pirolitariya Turkî bi serêxwe ve bi tenha ve nikaribe xwe bide biserxistin" (R. 80).

Di pişt re ew hêrîşê ji bona Partîya -TKP- kevin mîna tê dide bikirin, ku "Rêberîya TKP kêspereşt tanî niha wê bi mafeyê Netewê Kurd ve di Çarenûsa wî de pê nehatîye birûniştin. Belê wêna weha ji bona Netewê Kurd mafeyê wî di Çarenûsa wî de dayite binayînîkin. Weha ji bona Netewê Kurd jî ev mafeyê hanê jî û pêrejî têtîde pêkanîna Dewleteke Serbixwe ve tete biderkevtin" (R. 157).

Di pişt re jî ew wê biryarîyê dide bianîn, ya ku Partîya wî derbarê pirsîyarîya Kurdîyî welatî li Turkîyê de di Konfîrensê sala 1980 de daye biwergirtin. Evaya jî navroka wê bi xwe ye:

"Li Turkîyê de pirsîyarîya welatî bes û bi tenha ve bi pirsîyarîya Kurdî ve tete bigirêdan. Di nava sînorên vê Dewleta hanê de Netewê Kurd ji çaryekê ji tevaya Xelkê dide bipêkanîn, lêbelêjî ew Neteweyekî zordarî lê tete bikirin. Kurdîstana Turkî ew bi xwe ve bi heremkê tete biderkevtin, ya ku ew bi darê zorê ji bal Turkan de bi Turkî ve hatîye bipêvekirin. Weha xêr û bêrên wê ji bal Turkîyê de bi hevkarîya Çînîya Maldarîyî Kurdî ve tete biçewisandin. Wisa Kurdîstana Turkî bi xwe ve bes û bi tenha ve nala Kolonîyeke hundurû ji bona Turkîyê tete

biderketin. Niha Çînîya Nîv Derebege bi xwe ve bi kêm jimar ve li Kurdistanê hatîye bikirin û bes û bi tenha ve jê gemareke biçûk hatîye bimayin; jiber ku sermiyan weha li ser abûriya Kurdistanê de hatîye bizalkirin. Sermiyan ango Sermiyanê Dewletê û Monopol bi xwe ve li Turkîyê de têtin bizalkirin û serdarîyê didin bikirin; wehajî jiber vê jî Zordarîlêkirina Netewê Kurd û Çewisandina wî li ser bingehên nuh de metirsî û sertbûna wê hate bibêtirkirin. Lêbelê jî ligel katbûna Sermeyedarîyê de li Kurdistanê de pêrejî tevergera welatîyî Kurd jî hate bikatirin ...hd. Weha heger ku em Komonistên Turk dijî kêspereştîyê û şovînistîyê xebatê nedin bikirin, dê emê ji bona wergirtina bawerîya Gelê Kurd bi me ve neyêtin biserkevtin. Herwehajî li ser me de tete bidîtin, ku em bi xwe jî ve dijî Berê Milî li nik Komonistên Kurd de bidin bixebatkin" (R.166 ji wê nivîstokê bi xwe ve).

Lêbelê Partîya -T K P- kevin, ku li ser "Rêberîyeke Kêspereştî" de, li gora têngîhiştina rojnama Dengê Kargeran daye biparastin, hêjî tanî wê hingavê bes û bi tenha ve bi rastî ve navê Kurd li Turkî de nala "Kêmanîyeke Milî" dida bianîn. Weha bi navkirina "vî Gelê hanê ve bi Kêmanîyeke Milî" ve di navbera Kêmanîyên Milîyî din de mîna Ermenîyan, Çerkesan, Ereban, Lazan, Yunanîyan û yê din ji Kêmanîyên kêma jimar li Turkî de û weha jî civandina wan tevdan di yek endazî de û bi yek giringbûnê ve -birasttir-"bi bê giringbûnê" ve didin "bifetisandin".

Weha li ser ketina siyaseta vê Partîyê û perçebûnên wê de, mîna ku ew li jor de hat biderkevtin, û civandina Desteyên Siyasî û Kargerîyî Kurd di Partî û Rêxistinên

taybetî de bi wî ve û zeftkirina wan li ser vê partiya hanê de bi xwe jî ve û herwehajî piştî wergerandina Sipahîyî sala 1980 bi sê sala ew bi guhertina rawestandina xwe ve beramber bi Kurd ve hate bineçarkirin û wê devji navkirina Gelê Kurd "bi Kêmanêyekê ve" date biberdan. Belê ew bi poşandinê ve hate bipêrûniştin, ku "pirsiyarîya welatî li Turkîyê de bes û bi tenha ve bi pirsîyarîya Kurdî ve têtê bigirêdan".

Weha di bernameya wê de du letên biçûk têtin bidîtin, ya ku ew di Kongirê wêyî Pêncem de di meha çirya paşî de ji sala 1983 de li ser de hate bibiryarkirin, ku ew ji giringbûnê ne bi valanyî ve têtin bidîtin. Letê yekem di bin nav û nîşana "Miletê Kurd" de hatîye binivîsandin û letê duwem di bin nav û nîşana "Çarekirina Pirsîyarîya Welatî" de hatîye binivîsandin. Herdu Let jî ligel hevdû de ji bona pirsîyarîya Kurd hatine bitirxankirin û bi hîç renekî ve di wan de navê hîç yekê ji "Kêmanîyên" din ne hatîye binivîsandin...Evaya jî bi xwe jî ve bi karekî ve têtê biderkevtin, ku pê serê Merov jî têtê bisurandin; jiber hebûna Netewê Kurd li Turkîyê de, ku ew ji çaryek ji tevaya Xelkê dide bipêkanîn, nabe, ku ewji bona bi nayînkirina hebûna Kêmanîyên Milî û Olî ve bide bikirin, ji yên ku ew bi xwedan mafe ve têtin biderkevtin. Bi erke ve têtê biderkevtin, ku li ber wan de bête bidan.

Weha partî bernameya xwe bi Turkî ve li derveyî welêt de date bibelavkirin, piştî ku rêberîya wê ji bona barkirina derve û dûrbûnê hate bineçarkirin. Bernameya wê di nava 46 rûpelan de têtê bidîtin²⁵. Eva tê bi xwe ve bi naveroka

²⁵Cf. Turkiye Komonist Partisi Programı, 5 Kongre, II, T K P. Yayınlarım, çirya pêşî sala 1983 de

herdu letên ve têtê biderkevtin, ya ku ew li jor de hatine binavkirin. Ew bi xwe jî ve kêmi endazê têtê bidîtin, yê ku Partîya -T K P- Lênîni li jor de daye binavkirin: "Miletê Kurd: Ew beşekî girînge ji Xelkên Turkîyê dide bipêkanîn, wehaji ew di bin du nîrên zordariyê de têtê bimexelkirin. Wisa Miltê Kurd ne bes tenê di bin zalbûna Zemîndarên Mezin de û di bin zalbûna Monopolên Darayîyî Hunduryî pir Miletîyî Derve de têtê bijiyandin, herwehaji pêrejî Borcuwazîya Turkî dijê wî siyaseta zordarîlêkirina Milîyî Berberî dide bikaranîn.

Weha di navbera Xebatkerên Kurd û Turkan de pêwendiyên pir xurt têtin bidîtin û ji bona wan jî yek Dujmin bi xwe jî ve têtê bidîtin. Kargerên Turkan wê siyaseta zordarîlêkirina Milî û siyaseta azardanê didin bitawakarîkirin, ya ku ew beramberî Miletê Kurd têtê bikaranîn.

Weha heger Miletê Kurd ji ber xwe xwest, ku ew ligel Miletê Turk hêjî di Dewleteke hevbeşî de bide bijiyankirin, weha dê ev Dewleta hanê xwe wisa li gora mercên mêjûyîyî wê demjimarê de xwe bide birêxistin. Wehaji Dewleta Demokrasî di ayinde de ew dikare bi mafeyê Miletê Kurd ve di Cihêbûnê jî de pê bête birûniştin, heger ku Miletê Kurd dilê xwe pê date bijandin. Ji bona berjewendîya sosyalistîyê û xebata Kargeran divê li ser Komonistan de ew bidin bikarkirin, ji bona ku pirsîyarîya kurd bête biçarekirin. Weha Komonist Dewletekê didin bidaxwazkirin, ku ew li ser Demokrasîya Navînî de têtê bipêkhatin" (R. 42 jibernameyê)²⁶.

²⁶Ev gotara hanê di Kovara Al-seqafe Al- cedîde, a ku ji bal Partîya Komonistî Îraqî têtê biderketinin, di jimara 134 de hatiye bibelavkirin.

Weha tête bidîtin, di nava wan Letan de, yên ku di vê bernameya hanê de li ser nasîna "Miletê Kurd" de hatine binivîsandin, ne navê "Kurdistan", ne jî pesinandana wî hate bidîtin, ku ew nala Neteweyekî tête bidîtin, ne jî Kurdistan, " ku ew bi darê zorê bi Turkiyê ve hatîye bipêvekirin", ne jî Kurdistan, ku ew nala "Koloniyeke Hundurû ji bona Turkîyê" tête bidîtin.

Lêbelê jî yên di bernameyê de li ser "Çarekirina Pirsîyarîya Welatî" de hatine binivîsandin, ew bi mijin û ew Çarekirina Pirsîyarîya Kurd li Turkiyê de ji bona paş biserkevtina Şûreşa Markisîyî Kargerî, pêkanîna Dewleteke Gelêrî û li gora "Mercên Demjimarê" didin bihiştin. Wehajî ev Partîya hanê -bi kêmanî tanî sala 1983 de- mabû, ku wê Wergerandina Sipahîyî Faşîyî Turkîyî sala 1980 "bi Faşîstîyê" ^ve ne dixwest bide binavkirin. - Li Pêşewazîya Ceneral Êverin Serokê Serdarîya Sipahî de li Sofya de di sala 1982 de bide bitemaşekirin-. Evaya jî bi xwe jî ve ji deqên bingehîyî din bûn, yên ku di wan de Berê Dengê Kargerên Komonistî ligel wê Partîyê de dihate bicudakirin.

Wehajî tev li van cudabûnên diyar jî de tête bidîtin, ku herdu perên bendedar di Partîya Komonistîyî Turkî de Çarekirina Pirsîyarîya Welatîyî kurd tanî piştî bi serkevtina Şûreşa Markisî ve di Turkiyê de, ligel jî pêrejî tanî wê hingavê jî de bi yekkirina herdu tevgeran didin bihiştin. Ew dibêjin, Lêbelê bicihanîna Şûreşa Sosyalîstîyî Cihanî ji bona bi yekkirina Pirolitariya Kurdî ve ligel Pirolitariya Miletên dorhêlê de, mîna ku ew li jor de hatîye bigotin, bi xwe ve ev bi karekî zor dijwar û pir dûr ve bi wî pêgihandinê ve tête biderkevtin.

Dibe, ku ew piştî heyamekî bête bicihanîn, wehajî dibe, ku ew neyête bicihanîn. Ligeljî bi serdejî Çîniya Kargerî Kurdî bi xwe jî ve tanî endazekî bi xwedan jimareke biçûk ve tête biderkevtin. Wê xwe bi beşî ve di nava Sazmendiyên Kurdîyî taybetîyî de ji xwe re daye birêxistin, ku ew di piranîya caran de ji bona rizgarîkirina Welêt û bi yekkirina Kurdistanê ve nemaze li Turkîyê de dide biarmancikirin. Wilojî hêjî perçeyekî din jê jî li derveyî her Sazmendîyekê de maye bihiştin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku dê li dûhevdû de bête bidîtin, ku ew xwe dê di bin ala tevgera welatîyî rizgarîkirina Kurd de bide bibirêxistin. Weha vaye, em vê jî her roj dibînin. Ma gelo dê çî bi serê Miletê Kurd de piştî nêzîka sedsalekî din bête bikin? Weha pêrabûnên belavkirina wî ji hev ji pêla Diktatorîya Mustafa Kemal de, yê ku hîç Navnîşana "Bavê Turkan" pê nayê bikevtin, dane bidestpêkirin. Wehajî gerjî serjimara kurdan bi nêzîka 22, 5 milyon Kes jî ve têtin bidîtin, ji wan bes û bi tenha ve li Kurdistanê de nêzîka 17, 5 milyon Kes dimînin û nêzîka pênc milyonan ji wan li derveyî welatê xwe de li ser enacmê barkirinên kevin de têtin bijîyandin, herwehajî ji ber zordarîya nuh û ji ber paşvexistina abûrîyî Kurdistan tête biderkevtin, ya ku bi serê wê ve bi zanebûn ve ji bal Kolonyalîgerê Turkî de tête bianîn²⁷.

²⁷Ev jimarên hanê ew bi xwe texmînin, yên ku ew ji bal Nivsvanê van dêran li ser bingehê amarên sala 1981 de hatine bipêgihaştin. Lêbelê jimara pênc milyon ji Kurdên, yên ku ew li derve de dijîn, ew Komên Barkirîyên Kevin û yên tar û markiriyên nuh (bêtir ji nivê wan ji Turkîyê ne) û di nava wan jî de Kurdên Barkirîyên ji bona Ewropa, Lubnanê û yên Sovyîtê jî bi ber xwe ve didin bixistin.

Ma gelo Miletê Cezayir çavdêriya rizgarîkirina xwe di rêya Şûreşa Sosyalistîyî Pirolitariyî Markisî de li Firensa de û "di Melbenda wêyî Cezayirê de" date bikin? Na hêjbêtir, ma gelo wî çavdêriya pêşveketina Çêkirina Sermeyedarîyê, gewrebûna wêna û bêtirbûna jimara Çînîya xweyî Kargerî di welatê xwe de date bikin, berî ku ew "Şerê man û nemana xwe" bide bilidarxistin?

Weha ji Çînîyên Gelêrî yên Milîbûnên zalkirîyî Kolonyalgerê Kurdistanê nayête bixwestin, ku ew çek li pênavê rizgarîkirina welatîyî Kurd de bidin bihilgirtin. Lêbelê dide bitêrkin, ku ew ji dil û can piştta wê bidin bigirtin û gerjî wan jî date bixwestin, bi kar jî ve ew dikarin piştta wê bidin bigirtin û ew piştgirtina xwe ligel xebata Miletê Kurdistanê de bidin bizanîn, wê hingava ku ev Miletê hanê bi destpêkirina şerê man û nemana xwe ve dide bizanîn.

Ew roja hanê bi xwe ve vaye tê û dê zengilê demjimara wê lê bide bidan. Bi her awayekî jî be, şerê man û nemana Kurd nikare ew bi xwe ve weha bête bidîtin, mîna ku hatîye bikin, yanjî mîna ku ew tanî niha li Kurdistanê de tête bikin. Weha dibe, ku li ser beramberkirina di navbera Kurdistanê û Cezayirê de bête bidijîgirtin. Lêbelê herdu zînet di bingeha xwe de bi nalahev ve têtin biderkevtin.

Weha Cezayir "Melbendeke Firensî" bû, yanî Kolonîyeke hundurû jêre dihate biderkevtin. Ew jî nala perçên Kurdistanê di nava wan Dewletan de dihate biderkevtin, yên ku wan ew wê ji xwe re dabûn biparvekirin. Li wê derê de du cudabûn têtin bidîtin:

Yekem. Cezayir di bin nîrê Kolonyalîya Dewleteke Borcuwazîyî Pêşveketî de di Çêkirinê de dihate bîmexelkirin, di dema ku Kurdistan bi agirê "Kolonyalîya Perîşan ve ji bona Hemsayê xwe" tete bisûtandin. Ewaya bi xwe jî ve ji ya berî xwe, Weke ku ev bi eşkere ve tete biderkevtin, bi çepeltir ve û bi notir azarî ve tete biderkevtin.

Duwem. Derbarê cudabûna ku di navbera Firensa û Cezayirê de dihate bidîtin. Weha Miletê Kurdistan û Miletên dorhêlê tev bi hev re ji bona yek herema şaristanîyê têtin bigihaştin û ew bi pêwendîyên pir bi hev re têtin bigihandin. Wisajî ji vena du Encam yanjî du erk têtin biderketin:

Yekem divê li ser Çînîyên Gelêrî de nemaze yên Kargerî jê li nik Milîbûnên zalkirî de li ser Kurdistanê de ew piştgirtina xwe ligel Gelê Kurd de di şerê Çarenûsê de bêtir di firehbûn, kûrbûn û lezbûna xwe de bidin biderxistin, ji ya ku Çepên Firensî ji bona Gelê Cezayirê di şerê wî de jêre dane bipêşkeşkirin.

Duwem, wê hingava demjimar tê û Netewê Kurd bi darê ço ve azadîya xwe bi carekê vê dide bisitandin, danîna pêwendîyan di navbera wî û Netewên dorhêlê de têtin bixwestin, ku ew bi bêtir ve bi Merovanîyê xwe ve, bi Nêzîkbûna xwe ve û bi Biratîya xwe ve bidin biderxistin, ji yên ku em niha wan di navbera Firensa û Cezayirê de didin bidîtin.

Weha karina hevgirtinê di navbera van Netewên hanê de dikare bête bikirin, lêbelê mercê wê jî, yê ku divê bête bidîtin, bi xwe jî ve bi dawî anîna rizgarîkirina Kurdistanêyê welatî ve tete bidîtin. Hemû peyvên bêyî van

bi xwe ve ew bi "Felsefeyên Sofistî ve", yanjî şaşbûneke di hêjakirinê de têtin biderkevtin, yanjî bi "liberhevexistinên Tektîkî ve", têtin biderkevtin, ku cih ji wan re nayête bidîtin. Bes û bi tenha ve bi wan ve dem û xwîna giranbuha têtê biwindakirin .

7. Sitratîciya Ayindeyî Siyasî

Dibe, ku bête bigotin, li ser yê ku li jor de hatîye bigotin. Dibejî, dijî li ser wî de ji bal hin Birayên Kurd de bi xwe jî ve bête bigirtin: Belê ev peyvên hanê pir şêrînin, na hêjêbêtir ji vê armanca hanê jî ji bona rizgarîkirina Kurdistanê û danîna hemû Miletên heremê di zîneteke wekhevîyê de bi armanekeke berztir ve tete biderkevtin, ku ew ji bona wan hevkarîyê û xurtbûna Biratîyê di navbera wan de rê pê dide bidan. Lêbelê ma dê çawa Kurdistan nala welatekî bête birizgarîkirin; jiber ku Dujminên vî Miletî pir bi zor ve têtin biderkevtin û hêjêbêtir li pişta wan de Impiryalî tete birawestandin?

Wehajî hegerjî Miletêk ji bona armanca çarenûsê, ya ku ew jêre armanc dike, bi rastî ve xebatê neke, ew hîç tiştekî jê bi destên xwe ve nade bixistin. Weha sitratîciya pêwist bi xwe ve ew bi sitratîciya ayinde ve tete biderkevtin û sitratîciya ayinda bi xwe ve ew bi sitracîya nêzîk ve tete biderkevtin. Ew Sitratîciya hanê bi xwe jî ve pêwistî bi karxistinê û avanîkirinê ve tete biderkevtin. Dibejî, ku ew pêwistî bi çend salan jî ve bête bikin. Wehajî û jibervêjî divê ji niha jî de dest bi danîna bingehên wê ve bête bikin.

Berî ku ew bête biraxistin, da ku ew raxistina hanê li gora rastîyê deû ne li gora evsanê de bête bidîtin, divê li ser me de ku em li ser zîneta rewşa li Kurdistana Îran û Îraqê niha de bidin biaxivtin; jiber ku di nava her yekê ji wan de şûreşeke welatîyî çekdar tête bigerandin, ku ew ji bona Xwedmoxtarîyê piştî bicihanîna Demokrasîyê li tevaya Îran û Îraqê de dide biarmanckirin.

Wehajî li virjî de carek din jî pêwist pê nîye, ku bête bidubarekirin, ku her Kurdekî dilsoz bi serketina van herdu şûreşên hanê û bicihanîna armancên wan bi hêvîdar ve tête biderkevtin -hegerjî ew jî di xebata wan jî de ne yête bibeşdarîkirin-. Wehajî hegerjî biserkevtin jî bête bidîtin, dê Miletê Kurd di van herdu deverên hanê jî de bêtir jî ji Xwedmoxtarîyê bi bendewar ve bêtin biderkevtin; - jiber ku evaya bi serêxwe ve bi guhertineke koçî ve tête biderkevtin. Wehajî dûr jî yanjî nêzîk dê Miletê Kurd ji nûve carekedin dest bi xebatê ve ji bona rizgarîkirina welatîyî bi carekê vê û yekkirina Kurdistanê bide bikirin, hegerjî evjî li gora dilê bidesthilatîyên Xwedmoxtarîyê de bête bidîtin yanjî neyête bidîtin. Belê dibejî, ku ew hêzên welatîyî siyasî jî, yên ku wan ji bona Xwedmoxtarîyê dane bixebatkin û ew dane bicihanîn, bi xwe jî dê durujmê xebatê ji bona raperîna nuh ber bi pêş ve bidin bibelavkirin.

Weha careke din dê emê xwe beramber bi pêwistîya danîna sitiratîcîyeke nuh bidin bidîtin, ya ku ew ji bona rizgarîkirina welatî û yekkirinê dide biarmanckirin. Serdarîyên Borjuwazîyî Diktatorîyî zalkirî li ser Kurdistanê de vê rastîya hîmkirî di hêvîyên Miletê Kurde de xwe pê nadin bixapandin, hegerjî çawajî Partîyên

têkoşer jî xebatê ji bona Xwedmoxtariyê jî di bin vî durujmê hanê de, yanî yê Demokrasiyê de, yanî di bin durujmê "Îraqîkirina Şûreşa Kurdî" de -weha !- "yê çêkirî de" jî xwe bidin biperdekirin û bipoşandin. Wisa tête bidiyarkirin, ku belê demokrasî dibe bikaribe bête bicihanîn û Netewê Kurd hêjî per û baskên wî perçekirî û ew hêjî di bin zalkirina Borcuwazîyên dinî Serdar de tête bihiştin! Wehajî jiber vê hoyê hanê jî bicihanîna Xwedmoxtariya Rast û Durust û Demokrasiya bi rastî jî nikare bête bicihanîn -xwezîjî ez di vir jî de bi şaş ve bihatima biderketin-. Bi serdejî ve Xwedmoxtariya hundurû jî bi serêxwe jî ve ew bi xwe ve nikare nala çarekirinekê ji bona pirsîyarîya Kurdî bête bidîtin.

Bi vî rengî ve Kiris Kutçêra di nivîsta xwe de "tevgera welatîyî Kurd" bi sersûrî ve li ser vê guhpêdana vê tevgerê li her heremekî de ji Kurdistanê dibêje, ku ew ji daxwazên nerim bêtir ji "Xwedmoxtariyê di nava sînoren Dewletên heyî de pêve naxwazin" û "ew ji dujminayetiye ligel Dewletên dinî din de tête bitirsadin, yên ku Kêmanîyên Kurd di nava wan de têtin bidîtin", heger ku wê "bi daxwazên Giştî" ve date bidaxwazkirin: "Weha em nikarin biliberkevin, bê ma dê çawa Kurd bikaribin xwe bi xwe ve bidin bibawerkirin, ku nala van kosetîyên hanê ji bona xanpandina Dewletan dikarin bêtin bitêrkirin: Weha ne bes tenê durujim bi xwe ve Dewletan didin bitirsandin, lêbelê bi xwe ve hêzên rastîyên van tevgerên Milî wan didin bitirsandin"²⁸.

Lêbelê cenga Îran-Îraqê ligel wê jî de pêwendîyên hemsayî û hêsankiran di navbera tevgera Xwedmoxtariyê

²⁸Chris Kutchera, Le mouvement national Kurde, Paris 1979, R. 355

de li Îranê û Serdarîya Bexdadê de ji alîyekî de û di navbera tevgera Xwedmoxtariyê de li Kurdistana Îraqê û Serdarîya Tehranê de ji alîyekî din de hatin bikirin. Wehajî lawazîya vê tevgera Xwedmoxtariyê dawî jî û bigir tawîbûna wê jî jiber pevçûnên Partiyên wê ligel hevdû de û pêrabûna yekê ji wan bi lihevhatinê ve yanjî hajbûnê ve ligel "Serdarîkirina Efleqîyî Faşî" de û mana ya din li ser rawestandina xwe de di şerê vê Serdarîkirinê de tête bidîtin; jiber û ji dema ku karîna rêkirina derveyî Diktatorîya "Şûreşa Musulmantîyê" ji bona nava Îraqê hate bigewdekirin²⁹. Wehajî Merov jî dikare bêje, ku zîneteke wisa hate bipeydakirin, ku ew pir bi metirsîyên nuh ve tête bidagirtin, ku ew Miletê Kurd û tevgera wî tirsan têde didin bifirandin.

Wehajî evaya nimûneyekî pir diyare, ku Tevgerên Xwedmoxtariyê ew di serûştîya xwe de nikarin li ser siyaseteke serbixweyî de bêtin biçûyîn. Di dawîya dawî de ew bi xwazin yanjî nexwazin, dê ew bidin bikarkirin, da ku ew belkî ji dijûnên Dewletên Koloyalîkirên Kurdistanê sûd bidin biwergirtin, tevî ku ew Dewletên hanê jî di zordarîlêkirinê de mîna hevin.

Ji vê siyaseta hanê jî di dawîya dawî de bes û bi tenha ve yê Xurt ji yê Lawaz, yê Serdar ji yê Bende ji xwe re jê kar dide bidîtin. Wehajî hêjî di mêjûwa nuhî Miletê Kurd jî de wî xwe li ser xwe de weha perçekirî di rêya Partî û Rêberîyên xwe de nedaye dîtin, mîna ku ew niha di nav de

²⁹Min bi zanebûn ve navên Partiyên pevçûnvan ne anî û herwehajî min nexwest, ku ez berpirsiyarîyê bi ser hustuwê alîyekî ve bidim biavêtin, da ku belkî hajbûn di nava wan de bête bicihanîn.

tête bidîtin.

Dilovanî û mehrebanî ji bona Mele Mustefayê Berzanî bête bidîtin. Weha çend dûrbûn di navbera yekbûna sincîyî Kurdî de, ya ku dikarîbû -bi kêmanî ve tanî sala 1973- bête bidîtin û vî şetrencê sersûrayî ji van Partîyên hanê û pêrejî ev pevçûnên Partayetî jî têtin bidîtin, yên ku ew niha li kurdistanê de têtin biderkevtin. Wehajî ev cenga di navbera Îraq û Îranê de bi vê yanjî nevé mîna her cengeke din di navbera du Dewletan de dê bête bidawîkirin. Dibe, ku ev roja hanê jî nêzîk bête bidîtin. Xwezî ew ji bona Gelê me "Peymaneke Cezayîrîyî" nuh ne de bianîn, da ku laşê wî careke din bi birînan neyête biaxivandin.

Wehajî hegerjî neyête bizanîn, bê ka çilo dê ev cenga hanê bête bidawîkirin, lêbelê jî ji niha jî tête bidiyarkirin, ku dê bi dawîanîna wê navê Serdarîya Tehranê bi ser navê Enqera û Bexdadê ve di peymaneke perestîyî nuh de ji bona lêdana tevgera Kurd li ser bingehên nuh de bide bixistin.

Ji alîyê din de Kurdên Turkîyê , yên ku ew nîvê Miletê Kurd didin bipêkanîn, ew ji bona xwe çarekirinên nîvî yanjî koçî nadin bixwestin, lêbelê ew çarekirinên giştî ji xwe re didin bixwestin.

Weha Kiris Kutçera li ser siyaseta Partîyên Kurd de, yên ku ji bona Xwedmoxtarîyê ji her perçeyekî Kurdistanê re bi tenha xwe ve di nava sînorên Dewletên hene de didin bibangkirin, dide bigirêdan û ew dibêje:

"Hegerjî Kurd bi vî rengê hanê ve nala rastîyeke her heyî ji bona wan pêwendiyên di navbera Sitemkar û

Sitemkêş de hate bipêrûniştin, wisajî bes û bi tenha ve ev pêrûniştina wan bi xwe jî ve nivê şer ew ji xwe re pê didin biwindakirin"³⁰. Di pişt re ew pê dide bivekirin: "Di vê roja me de, da ku ji bona tevgera Kurdîyî welatî şansek ji bona biserketinê bête bipeydakirin, divê li ser wê de bi renekî taybetî ve ew xwe di nava perçeyekî de bi tenha xwe ve ji Kurdistanê, çî li Kurdistana Îranê, yanjî li Kurdistana Îraqê yaxud li Kurdistana Turkîyê de bête bidîtin, xwe nede bisînorkirin (...) Wehajî bi tu renekî jî ve dê ji Kurdan re hîç bextek ji bona bi darê zorê ve danîna Netewê xwe nala Neteweyekî neyête bidîtin, heger ku ew hemû hêzên xwe nede biyekkirin, bi Miletê xwe ve nede bişiwirdarîkirin û xwe bi xwe ve di nava tevgerake yekkirî de bi ser hev ve nedin bicivandin. Evaya jî bi xwe jî ve ji wan dide biniyazmendîkirin, ku ew di pêşîya pêşî de ji nava serên xwe ji bona nava dilên xwe wan sînoran bidin bihilanîn, yên ku ew bi wan ve pê hatine birûniştin"³¹.

Weha ew remanên hanê, yên ku ew di rûpelên çuyî de hatine biraxistin, û yên ku niha dê li jêr de li ser wan de bête bigirêdan, tevde bêtir û bêtir di nava serên bi hezaran de ji Zanevanên me û ji Xortên me têtin bigerandin û bi milyonan ji Zaroyên Miletê me bi navrokên wan ve pê têtin bihestkirin. Belê ev rûpelên hanê hatine bidirêjkirin û ez li ser xwe de bi divayî ve kurtkirina wan didim bidîtin.

Weha ez dê vê di movikên kême de li dû hevdu de "Hîmkirina Mafeyên Netewê Kurd", "Dam û Destgehên

³⁰Kanîya Pêşî

³¹Kanîya Pêşî

Xebata Siyasî", "Armancên Xebatê" û "Biryareyên Xebatê" bidim bianîn. Wehajî di dawî jî de dê ez careke din di bin nav û nîşaneke nuh de "Şêweyên Xebatê" lê bêtim bivegerandin. Ev bi xwe jî ve Sitratîcîya Sipahî dide biwergirtin.

Wehajî carekedin pêwist pê niye, ku bête bigotin, ku ez bi hîç rengê ve di nivîsandina van dêrên hanê de nadim biremankirin, ku ez xwe bi xwe ve di şûnekê de bidim bidanîn, "yê ku ew" Xelkê din û Birayên xwe " dide bifêrkirin".

Herwehajî di nivîsandina wan jî de ji bil bi pêrabûnê ve bi erkê welatî û demokrasî ve, na hêjîbêtir bi erkê Mirovanî ve bi palpêdaneke dinî bêtir ve pê vê nayête bidîtin û herwehajî derkirina tiştên ku ew di nava mejîyên bi milyonan ve ji Zaroyên vî Miletê hanê têtin bigerandin û tiştên ku ev Miletê hanê ji nivê nava cergên xwe jêre dide bihêvîkirin.

Ji bona bi hîmkirina mafeyên vî Netewê hanê ve dide bitêrkirin, ku ji bona rewşa wîyî niha û ji bona mafeyên wî li ser ronahîya Yasa Netewên Hevgirtî de û li ser danîna yasayên wê de bête bipênîşandin, yên ku wê ji bîr û bawerîyan û peymanan derbarê mafeyên Mirov û mafeyê hemû Miletan di çarenûsa xwe de bi xwe ve dane biwergirtin.

Niha pêkhatina Komela Dadyarên Kurd nala Komeleke Dadyarîyî ne siyasî tete bipêkhatin, ku ew Parêzvanên Kurd û Dadyarên wî ji hemû perçên Kurdistanê ji bona liberxwedana mafeyên vî Miletê hanê nala Miletêkî Neteweyekî û Kesan dide bicivandin. Lêbelê hêjî

pêkhatina wêna nehatîye bilikarxistin. Weha min di civîna yekemînî pêkhatinê de ji bona Hevalên xwe date bipêşkeşkirin, ku em bi navê Komelê Yasa Mafeyê Netewê Kurd bidin bilikarxistin û bidazanîn. Tevaya Hevalan pê hatin birûniştin. Weha di civîna pêkhatinê de ya tê dê emê, ger Xwedê xwest, ji bona pêkhatina Komelê, likarxistina wê û belavkirina yasa biserkevin. Ev yasa hanê dê xwedan nerxekî giringî wêjeyî, sincî û mêjûyî bête bidîtin, ku dê ew bikaribe bawerîya Netewê Kurd bi mafeyên wîyî bingehî ve bide bixurtkirin. Dibe, jî ku ew alîkarîya Desteyên Siyasîyî Kurd ji bona ronahîya rêya wan bide bikin. Dibe jî, ku ew rêzên wan bide biyekkirin û girêdanê li ser armancên bilind de bê pêç û pena jiber kêrên demjimarê bide bikin, heger ku wan ji xwe re date bixwestin.

Wehajî Yasa hîç tevaya giringbûna xwe nikare bide biwergirtin, hegerjî Miletê Kurd ji xwe re jî nikaribe tevgereke rizgarîkirîyî yek yanjî yekbûyî bide bipêydakirin, ku jêre Dam û Destgehekî Xebatîyî Siyasîyî yek yanjî yekbûyî tête bidîtin, ku ew bi bîr û bawerîyên bingehîyî hatîyî ve di Yasa de pê dide bibawerkirin û ew ji bona wan dide bixebatkirin, piştî ku ew wan di nava qalibekî siyasî de dide bivalakirin û armancên li ser wan de ji hev dide bicudakirin. Wehajî hegerjî me jî dîdarên mêjûyê û belgeyên mafeyî di ser guhê xwe re datin biavêtin, dê emê bi kêmanî ve danîna rewşa Netewê Kurd û mafeyên wîyî bingehî di deqên kêr de, nala yên ku ew tên, bikaribin bidin danîn:

- Miletê Kurd Neteweyekî, yê

ku ew bi xwe ve têtê biderkevtin , bi xwedaniyên xweyîyên taybetîyên ji erd, ji ziman, ji mêjû, ji hêvî û berjewendîyên hevbeşî ve tevî perçekirina Welatê wî Kurdistan jî ji bal Kolonyalyê jî de dide bipêkanîn.

- Netwê Kurd niha ew di bin nîrê Kolonyalîyê de, Zordarîlêkirina Milî de, Vegirtina Sipahî de û Çewisandina Abûrî û Civakî de têtê binexkirin. Ev jî li ser encamê siyaseta şovîniyî regezperestî de têtê bikirin, ya ku hêjî ew Dewletên hanê li ser de têtin biçûyîn, yên ku wan Kurdistan di navbera xwe de ji piştî cenga cîhanîyî yekem de dane biparvekirin.

- Netewê Kurd mafeyê wî ji bona xebatê li pênavê tar û markirina zincîrên xwe û hilanîna bendên xwe de têtê bidîtin, yên ku wî ji wergirtina mafeyên wî û azadiya Kesên wî didin bibêpişk û bibêparkirin. Herwehaji mafeyê wî têtê bidîtin, ku ew bendên li pêşiya xwe de ji ber xwe bide bihilanîn, yên ku ew wî ji katbûna abûrî, pêşveketina zanyarî û pêşveçûna civakî didin bibêbehrkirin.

- Miletê kurd jî nala her Miletêkî din mafeyê wî di Çarenûsa xwe de bi xwe ve û bi tevaya azadîya xwe ve tête biderkevtin, ligel jî têjî de hilanîna sînorên çêkirî jî têtin bidîtin, yên ku ew per û baskên Welatê wî ji hev didin bidirandin. Herwehajî têde bi yekkirina Welatê wî ve di Dewleteke Kurdîyî Serbixwe de, di helbijartina rengê Serdarîkirinê de, yê ku ew ji xwe re dide bixwestin, di maldarîkirina dewlemendîyên erdê xwe û çewisandina wan de, di bikaranîna berkirina karê xwe de ji bona kara xwe, kara zarokên xwe û pêşvexistina abûrîya xwe û geşbûna zanyarîya xwe tête bidîtin.

- Netewê Kurd bi heremeke jîrdarî ve tête bimerovkirin, ya ku ew li rojhilata nêzîk û navîn de tête bidîtin. Herwehajî jêre jî pêwendîyên mêjûyî ligel Netewên dorhêlê de têtin bidîtin, ku Merov dikare wan jî, piştî ku Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve bi carekê vê di Çarenûsa xwe de bi xwe ve bide bikaranîn, li ser bingehên nuh de bide binîşankirin û bihîmkirin, ku ew wekhevîya bi carekê vê, aşîtîya mayî û hevkarîya biratîyî pêwîst di

navbera hemû van Netewan de û di navbera wan xwe bi xwe de didin bigirawkirin, li gora ku ew bi vîna xweyî hevbeşî û li pênavê berjewendîya wan tevan de, berjewendîya her yekî ji wan û ji bona pêşveketina jîrbûna heremê bi xwe ve didin bixwestin.

- Netewê Kurd bi demokrasîyê ve, bi avakirina aşîtîyê li ser bingehê dadwerîya civakî û bingehê dadwerîya siyasî û wekhevîyê de di nava Miletan û Netewan de, bi mafeyê hemû Mirovan û bi mafeyê hemû Miletan ve li cîhanê de di Çarenûsa wan de bi xwe ve li gora bîr û bawerîyên Netewên yekgirtî de dide bibawerkirin.

*** Danîna Dam û Destgehê Siyasî ji bona Rizgarîkirina Welatîyî Kurd:***

Weha cudakirina pirsîyarîya danîna dam û destgehê siyasî ji pirsîyarîya mafeyên Netewê Kurdîyî bingehî, yê ku bi kurtî ve li jor de hatine bigotin, ne jî ji armancên xebata rizgarîkirinê û biryareyên xebatê, yê ku dê li ser wan de bi kurtî ve bête binavkirin, nikare bête bikirin. Ango dam û destgehê siyasî ew bi xwe ve ji bona bicihanîna rizgarîkirina welatîyî Kurdîyî giştî û hilgirtina

xebata wî Destikekî neçarî ye. Bi têgihîştineke din danîna dam û destgehê) bi navkirî ve ew bi xwe ve xistina armancên koçiyî perçekirî nala Xwedmoxtariyê û guhertina wê bi armanceke bingehiyî bi tenha xwe ve dide biderxistin, ew jî bi rizgarîkirina Neteweyê Kurdîyî welatî ve tête biderkevtin. Evaya jî bi xwe jî ve çengbûnekê ji endazê tevgerên welatîyî Kurdîyî taybetîyî bi her perçeyekî ve -ew jî bi xwe jî ve pêrûniştin bi sînorên çêkirî bû, yên ku ew Impiryalîyê di nava Welatê me de dayite bipêkanîn- ji bona endazekî bilindtir dide biderxistin, yê ku ewaya ji bona tevaya Kurdistanê endazê welatîyî giştî û di tevgerê yekkirî de yanjî yekbûyî de dide biderxistin. Evaya jî bi kar ve û ne bi gotinê bi tenê ve, mîna ku em hin caran didin bidîtinn, divê bête bikirin.

Du rê ji bona danîna dam û destgehê siyasî têtin bidîtin û ya siyem niye:

Yekem: Ew bi xwe ve di rêya bi yekkirina Partî û Sazmendîyên Kurdî ve, yên ku ew têtin bidîtin, yanjî yên dê bêtin bidîtin, ku ew ji bona vê mebesta hanê di nêzîk de dê bêtin bipêkhatin, herwehaji ligel wan jî de Kesên Welatperwer, ji yên ku ew xwedan karî û dilxwaz di karkirinê de di xwe de dibînin, di Sazmendîyeke Kurdîyî welatîyî giştî de ji bona tevan tête bidîtin, piştî ku ew ji bona pêrazîbûna peyrewê welatî û armanca rizgarîkirina Netewê Kurd û devjêberdana armancên din ji bil wêna sînda pêwîst pê bête bixwarin.

Weha ji bona vî şeweyê hanê du sîd têtin bidîtin.

Yê yekem tête bidîtin; jiber ku ew li ber tevaya Partî û Sazmendîyên hene û ji bona Merevên welatperwer û demokrat rê pê dide bidan û ji wan tevan ketina nava dam û destgehê nuh û kelkwegirtin ji karnasîn û serpêhatîyên

wan têtê bixwestin. Weha bi vî rengî ve bi welatperwerîya tevan û bi xebata wanî çûyî ve pê têtê birûniştin.

Sûda Duwem ji lezbûna bikarina peydakirina dam û destgehê nuh de têtê biencamkirin. Na hêjbêtir sûdeke siyemî giring jî jêre têtê bidîtin, ku ew jî ji bona tevaya bawermendîyan û êdyolocîyan rê pê têtê bidan, ku ew di nava dam û destgehê nuh de bêtin bipeydakirin, bi mercekî ve ku ew bawermendîyên hanê bi demokrasî bêtin biderkevtin û ew ne bi regezperestî ve bêtin biderkevtin.

Wehajî dibe, ku ji bona vî şeweyê hanê jî hin encamên neqenc bêtin bidîtin. Ew jî evin, ku hin ji Partî û Sazmendîyên niha ligel xwe de ji bona nava dam û destgehê nuh tiştêkî û mayînên ji pevçûnên xweyî berê bidin bianîn. Evaya divê neyête bîkirin û divê zora wê bête bibirin. Herwehajî ligeljî de divê tevaya pevçûnên cihî, heremî, xweyî û mayînên êlîtî jî bêtin bihilanîn û divê li ser tevaya Partî û Sazmendîyên Endam peyrewa dam û destgehê nuh li ser peyrewên xweyî taybetî de bidin bidanîn; jiber ku ew dabeşka wênerîya berjewendîya bilindîyî Miletê Kurd dide biderxistin.

Weha ev şeweyê hanê bi xwe jî bû, yê ku ew ji bal Tevger û Sazmendîyên Felestînî ji bona bi yekkirina xwe ve di nava Sazmendîya Rizgarîkirina Felestînî de hatîye biwergirtin, bêyî ku ew xwe nala Sazmendîyan ji hev bidin bixistin. Lêbelê jî hemû pê hatin birazîkirin, ku ew berjewendîya Miletê xwe û peyrewa Sazmendîya Rizgarîkirina Felestînîyî hevbeşî li ser berejewendî û peyrewên xweyî taybetî de bidin bidanîn. Li vê derê de cudabûnek di vî babetê hanê de di navbera Sazmendîyên Felestînîyî Endam de di S. R. F. de û di navbera Partî û Sazmendîyên Kurdîyî hene de, yanjî di navebera hinekan

ji wan de tête bidîtin; jiber ku tevaya Sazmendîyên Felestîni ji bingeha pêşî de hemûyan ji bona Rizgarîkirina Felestîne didan biarmanckirin. Lêbelê giringtirîn Partîyên Kurdîyî heyî hêjê ew jî ji bona bicihanîna Xwedmoxtarîyê di nava sînoren Dewlîyî heyî de didin biarmanckirin. Pêwist pê niye, ku careke din li vir de bête bigotin, ku her Partîyeke Kurd ew nikare di dam û destgehê nuh de bi Endam bête bikirin, ger ku peyrewê wê di bingehîya xwe de ligel peyrewê dam û destgeh de di armanc û rizgarîkirina welatîyî Kurd de bi her têgihîştînekê ve bête bicudakirin. Wehajî dibe, ku dê dem bide bigirawkirin, ku dê Partîyên bi navkirî ve bername û armancên xwe bidin biguhertin. Evaya jî bi xwe jî ve pê tête bixwestin û biçavdêrîkirin. Weha bi lez ve dem tête bibezandin, ku pir dirêjkirina wê ne raste bête bikirin; jiber ku metirsîyan çavên xwe ji bona Miletê me dane beloqkirin. Lêbelê dam û destgehê nuh, di dema ku ew Sazmendîyan bi serhev ve dide bicivandin, yên ku ew li ser "Ewtonomiya" xweyî hundurû de di nav de didin biparastin, Merov dikare bi Berê Rizgarîkirina Kurdistanê ve û ne bi "Sazmendîyê", mîna ku Birayên Felestîni dane bikirin, bide binavkirin.

Rizgarîkirina welatîyî Kurd ew bi xwe jî ve di bingeha xwe jî de bi armanceke demokrasî ve tête biderkevtin û hîç demokrasî jî bê bicihanîna wê jî nayête bidîtin.

Wehajî tevlivêjî Merov dikare ji bona givaştîne bêtir li ser gotina demokrasîyê wê de di nava navê Berê de bide bixistin û Berê bi navê Berê Demokrasîyî Rizgarîkirina Kurdistan bide binavkirin.

Duwem: Ew bi xwe ve rêya ku Miletê Cezayirê ji bona peydakirina Berê Rizgarîkirina Welatîyî Cezayirî li ser de hatîye biçûyîn. Wehajî tevî ku gotina "Berê" jî di vî navê

mêjûyîyî qenc de hatîye biderkevtin, Berê Cezayirî bi xwe ve nemîna Berekî di nava jimarekê ji Sazmendî û Partîyan dihate bipêkhatin, lêbelê vanên dawî xwe bi xwe ve ji hev dane bixistin û tev de bi hev re bi carekê ve ligel Alî û Kesên welatperwerî din de di nava Berê Rizgarîkirina Welatî de hev dane bigirtin.

Xwezî jî Miletê Kurd jî bi ser vê rêya hanê ve bikarîba bida bigirtin; jiber ku ew bêtir bi kêrtir û serkevtî ve tête bidîtin û yekîtîya xebatê di nava wê de bêtir tête bidîtin. Wehajî ew jî bi serûştîya xwe jî ve di pêşîya pêşî de hîç rê bianîna mayînên pevçûnên berê de û mêldarîyên heremî de yanjî cihî de pê nade bidan, tevî ku ew jî di nava civakê jî de dihatin bipeydakirin. Weha civaka Cezayirî jî roja dazanîna şûreşa rizgarîkirina Cezayirî ew bi xwe jî ve nala her civakeke din jî bi dijbûnên xweyî taybetî û êdyolocîyên cuda ve, na hêjbêtir ew bi tovên cudabûnên ferhengî û zimanî ve di nava Xelkên wêyî Ereb û Xelkên wêyî Berber de dihate bidagirtin: Lêbelê jî tavaya van destê û berên hanê jî jiber xwe dijbûnên xwe dane bikerkirin û dev ji wan dane biberdan û tevde ji dil û can ligel hevdû de di dam û destgehê rizgarîkirina nuh de hatin bihevgihaştin. Ji bona wan bes û bi tenha yek armanc dihate bidîtin, ew jî bes û bi tenha ve xebat bû, da ku Miletê Cezayir mafeyê xwe di Çarenûsa xwe de bi xwe ve bide bikaranîn. Wehajî Xebatvanên Cezayirî hîç rê bi xwe ve nedane bidan, ku ew careke din ji bona tiştêkî ji dijbûnên xweyî hundurû bêtin bivegerandin, bes û bi tenha ve piştî ku Miletê wan mafeyê xwe di Çarenûsê û helbijartina xwe de ji bona Serxwebûnê bikaribe bide bicîanîn û xurtkirina wê Serxwebûnê di nava Dewletan de

bide bixurtkirin³².

Wehajî gerjî çibe, şêweyî ku Miletê Kurd û desteyên wîyî welatî ji xwe re jî bidin biwergirtin, hîç gûman lê nayête bikirin, ku dê ev Miletê hanê bi darê zorê ve li ser bête biçûyîn, da ku ew jî dam û destegehê xweyî siyasîyî niyazmendkirî ji bona rizgarîkirina xweyî welatî bide bidanîn.

*** Armancên Bingehî ji bona Tevgera Rizgarîkirina Welatîyî Kurd***

Ev armancên hanê ji mafeyên Netewê Kurd, ji zînetên hebûna wî û ji çarenûsa wî, ya ku ew bi xwe ve ji xwe re dide bixwestin, têtin bikanîkirin.

Weha Merov dikare wan, mîna ku ew têtin biderkevtin, bide bikurtkirin: -tevgera Miletê Kurd xebatê dide bikirine da ku Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de xwe bi xwe ve û bi azadî ve bikaribe bide bikaranîn.

- Miletê Kurd nikare bi vî mafeyê hanê ve bi azadî ve pê bête rabûn, heger ku ew rizgarîkirina Welatê xwe, jê derkirina hêzên

³²Piştî helbijartina Serok Şazlî Îbin Cedîd nala Serokê Komara Cezayir wî bi Mîrîtî ve bi bîr û bawerî û bi canekî Demokrasî ve bi Pirsîyarîya Ferhengî ji bona Koma Xelkên Berber bi pêrûniştina wê ve date destpekirin û wî bi çarekirina wê jî ve date destpekirin. Ev pirsîyarîya hanê bi xwe jî ve ji pirsîyarîya rizgarîkirina welatîyî Netewê Kurd tete bicudakirin.

Vegirtinê û yên Kolonyalîkirinê, yên ku ew bi Borcuwazîya Serdarkirinê ve têtin bigirêdan, yên ku wan di nava xwe de niha Kurdistan dane bidabeşkirin, herwehaji jê derkirina Gemara Civaka Kurdîyî xînez jî, ya ku ew ligel wan Hêzên Faşistî de hevkarîyê dide bikin, gerjî çijî ev Gemara hanê jî Sermeyedar bin yanjî Niv Derebege bin, neyîne bidawîkirin.

- Bi karanîna mafeyê çarenûs, piştî ku Dagîrvan tete biderkirin, di rêya pîrspêkirina azad ji bal Xelkên Kurdistanê de tete bikin, herwehaji tete Kurdên ji Welêt dûrkerî jî têtin beşdarîkirin. Wehaji bi xwe jî ve ew bi baştir ve tete biderkevtin, heger ku ew pîrspêkirina hanê di bin çavdêrîya Encûmena Netewên Yekgirtî de bête bikin.

- Armanc ji pêrabûnê bi mafeyê çarenûs ew bi xwe ve di rizgarîkirina Kurdistan de, di Yekkirina wê de û di Pêkanîna Dewleteke welatîyî Serbixwe ve li gora bîr û bawerîya pîrbûna Xelkê de tete bidîtin.

- Dewleta Kurd li ser bingehên Demokrasiyê û Serwerîya Milet de tête biavakirin, yê ku ew rengê serdarîkirinê ji xwe re û li gora dilê xwe de dide bihelbijartin û bixwestin. Herwehaji di nava wê Dewleta hanê jî de mafeyên Kêmanîyên Milî, Oldarî têtin bigirawkirin, Azadiyên Giştî têtin biberdankirin, Hatinên Welêt û xebatkirina Zaroyên xwe ji bona katkirina Abûrî, pêşvexistina Zanyarî û bicihanîna dadwerîya Civakî, nemaze ji bona berzkirina endazê Jîndariyê û Zanyariyê ji bona Çiniyên Gelêrî ji Cotkar, Karger û Destkaran tête bikaranîn.

- Tevgera Kurd ji bona rizgarîkirina Kurdistanê û bi serûştîya xwe jî ve ji bona nabûdkirina Faşistîyê, Regezperestîyê û Xwîngermbûna Oldariya kor dide biarmanckirin. Herwehaji pêrejî ew ji bona bicihanîna wan mercan dide biarmanckirin, yên ku ew dê alîkarîya çiniyên Gelêrî, nemaze yên Karger û Cotkaran li nik Miletên dorhêlê de di xebata wan de ji bona sitendina mafeyên xwe û azadiyên xwe bikaribin bidin

bikirin.

- Tevgera Rizgarîyî welatîyî kurd ji niha de ji bona peydakirina pêwendîyên hemsayî û hevkarîya Biratîyê dide bibangkirin, da ku ew ligel rojan de di navbera Netewê Kurdîyî rizgarîkirî de û Netewên dorhêlê de bêtin bixurtkirin, yên ku ew ligel hevdû û mîna hev de di navbera xwe de li ser têtin bilihevkin û ew rengên wan li ser berjewendîyên xweyî hevbeşî û berjewendîya her yekî ji wan de didin binîşankirin, da ku ew aşîtyê û dostanîyê û pêşveketina jîrdariyê li heremê de bidin biparastin û bilezkin. Weha di nava sedsalê yekem de ji hebûna Dewleta kurd nabe bête bîkin, ku ew dev ji liberxwedana welatî û Serdarîya Derveyî Diplomasî bide biberdan. Weha bes û bi tenha ve ew dikare bi pêwendîyên Konfederalî)ve ligel Dewletên dorhêlê de bide bitêrkirin. Wehajî ew dikare van pêwendîyên hanê hêdî hêdî ji bona Fêderalîya - Hevgirtî- piştî derbasbûna nêzîka sedsalê bide bipêşvexistin, gerjî ku Netewên heremê di nava xwe de li ser vê çarekirina hanê de bêtin bilihevkin.

- Tevgera Kurd Koma Dewletên Bê Alî dide bipiştgirtin. Ew jî li ser sorbûna xwe de ji bona hilanîna tevaya bingehên leşkerîyî biyanî li Kurdistana rizgarîkirî de dide bidazanîn. Herwehajî ew ji bona danîna pêwendîyên dostanîyê û hevkarîyê li ser bingehên wekhevîyê de di navbera Kurdistanê de û tevaya Dewlet û Miletên din de bi hemû cudabûnên rêstikên wan ve dide bikarkirin.

*** Bîr û Bawerîyên Xebata Rizgarîkirina Welatî**

- Jiber ku mafeyê Çarenûsê bi xwe ve ew di her bêhnekê de bi mafeyekî mayîn û her demî ve têtê biderkevtin, weha tevgera rizgarîkirina Kurd dikare xebata xwe di yek perçî de yanjî di çend perçan jî de li gora zînetan dide bidestpêkirin. Wehajî gerjî wê li yek perçî de date bidestpêkirin, li ser wê de têtê bipêwistkirin, ku ew wê ber bi pêş ve bide bixistin, da ku ew tevaya perçan mîna hev li ber xwe

de bide bixistin. Wehajî di hemû zînetan jî de divê di xebatê de du mercên neçarî bi bingehî ve jêre bêtin bidîtin:

- Divê armanca xebatê bi diyarkirî ve bête biderkevtin û pê hatibe bidazanînkirin: ku ev bi Pêrabûna mafeyê Çarenûsê û rizgarîkirina welatîyî Kurd ve tete biderkevtin.

- Ku tevaya hêzên Miletê Kurdîyî yekkirî di xebatê de bêtin bibeşdarîkirin.

- Çi gava xebatê date bideşpêkîrin, weha ew bi xwe ve şerekî lidûhev û dirêj de tanî bi serketinê ve dide biderxistin. Ev xebata hanê bi xwe jî ve bi tu renekî ve ne bi hajbûnekê ve û ne jî hîç bi "rawestandina teqemenîyekê" ve tete birazîkirin.

- Armancên xebata bilind ango pêrabûna Miletê Kurdistan bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de û di bin çavdêrîyeke Dewlî de bi xwe jî ve bi her renekî jî ve Kes nikare li ser wan de jê bêtin bidaketin yanjî bikêmkirin. Evaya jî

dide biderxistin, ku her pêşkeşkirinên ji bal Dujminan de ji bona Miletê me têtin bikirin, ew bi xwe ve bes û bi tenha ve têtin bikirin, da ku ew Miletê me ji xebatê bidin bidûrkirin. Mîna pêşkeşkirinên wanî Nîv Çarekirî, Guhertinên wan û Xwedmoxtariyên wan û yên din ji "Razîkirinan" ku ew ji bal wan de dihatin bipêşkeşkirin. Ne cih ji van pêşkeşkirinan re têtê bidîtin û bi serdejî ew ve di pêşîya pêşî de bi nayînê ve têtin bibersivkirin.

- Tevgera rizgarîkirina Kurd di xebata xwe de bi yek carî ve li ser xwe de wergirtina alîkarîyê ji her Dewletekê, ji yên ku wan Kurdistan di navbera xwe de dane biparvekirin, dijî yekeke din ji wan daye biqedexekirin, nemaze jî gerjî ku Dewleta yekem "Nîv Çarekirin" di nava sînorê xwe de "ji bona Pirsîyarîya Kurd" dayite bidazanîn; jiber di vê pêşkeşîya wê de bes û bi tenha ve xapandinek têtê bidîtin, da ku Miletê Kurd bi rawestandîna xebata xwe ve bête bibarkirin û di emcamê dawî de da ew careke din ligel Dewletên din de ji bona lédana wî lê bête

bivegerandin. Mîna ku niha ev têtê bikirin.

- Bi hîç corekî tevgera Kurd nikare ligel hîç Dewletekê ji wan Dewletan de yanjî ligel jimarekê ji wan de, ji yên ku wan Kurdistan di navbera xwe de dane biparvekirin, bide bigiftûgokirin. Bes û bi tenha ve ew wê çaxê dikare bide bigiftûgokirin, gava ku Dewletek yanjî Dewletan di pêşî de û beramber li pêşîya tevaya dunyayê de bi razîbûna xwe ve bi bîr û bawerîya pêrabûna Miletê Kurd ve bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de date bidazanîn û pêrejî ligel jî de hêzên xweyî çekdarî ji nava Kurdistanê date bikişandin, yanjî ku ev hêzên çekdar ji berê de bi xwe ve ew ji nava erdê welêt hatibûn biderkirin. Di bin vê zîmeta hanê de gift û gokirin li derveyî herema rojhilata navîn de li ser erdê Dewletek bê bendkirî de têtin bikirin Mîna ku gift û goyên Cezayirî - Firensî di vî babetê hanê de di sala 1962 de li ser erdê Siwêsrî de hatin bikirin).

Heger ku perçeyekî Kurdistan bêtebirizgarîkirin, kîjan jî bit, divê li ser tevgera Kurd de xebata xwe bi bê

westandin ve bide bikirin, tanî ku rizgarîkirina tevaya Netewê Kurd bête bidawîkirin.

- Xebata rizgarîyî welatî wê hingavê tête bidawîkirin, piştî ku tevaya Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de bi xwe ve bête bipêrabûn, Komara Kurdistan hate bidamezirandin û Serxwebûna wê hate bidazanîn û ew ji bal piranîya Dewletan de, nemaze jî ji bal Dewletên dorhêle de, yên ku Kurdistan ji wan xwe dayite biadzadkirin û bicihêkirin, bi pê ve hatin birûniştin. Serxwebûn û Cihêbûn ne bi "şermezarîyekê" ve tête biderkevtin, mîna ku hinek pê didin bibawerkin, lêbelê ew bi xwe ve ji bona vî Miletê hanê bi mafeyekî bingehî ve tête biderkevtin û ew bi xwe jî ve ji bona demokrasîyê bi mercekî pêwistî ve tête biderkevtin, na hêjbêtir ne rizgarîkirina Kurdistanê û ne jî Serxwebûna wêna ew bi xwe ve nexweşîyeke giranî û kevjalî di bin nav û nîşana Faşîtiyê de û regezperestîyê de dide bixwedîkirin. Lêbelê rengê Serdarkirinê di Komara Kurdistanê de dibe, ku ew bi Navînî ve bête biderkevtin, herwehaji dibe, ku ew li gora

xwestina Gelê Kurd de bi xwe ve bi Fêderalî -Hevgirtî- ve bête biderkevtin. Lêbelê Nivîsvan bi xwe ve çarekirineke Fêderalîyî Demokrasî ji xwe re ji ber hin hoyan dide biminêkarkirin; ku niha ji wan re cî nayête bidîtin, ku ew bêtin biraxistin.

8. Şeweyên Xebata Rizgarîkirina Welatîyê Kurd:

Ji destpêkirina mêjûwê de Miletê Kurd di warên Leşkerî de ji taktîka liberxwedanê, yanî bêtir ji liberxwedana li ber xwe de di çiya û deştên welatê xwe de ji beramberî hêrîşên derveyî pêve nedida binaskirin. Ev taktîkê hanê jî ji alîyekî de ligel serûştîya welatî çîyayî û ji alîyê din de ew ligel hişê Eşîrtîyê yaxud Derebegîyê tete bilihevkin. Wehaji hegerjî Hêrîşvan di hêrîşa xwe de hate bişikenandin yanjî ew tede hate biserkevtin, Miletê Kurd xwe di nava erdê xwe de dide biçogkirin. Ango Miletê me ji heyamên dirêj de di bin dilovanîya hêrîşên ji nişkêve dihate bijiyandin. Tevî ku di pir caran jî de Hêrîşvan piştî hustê xwe dida bixurandin û bi şikestî ve di cenga xweyî hêrîşê de ji Kurdistan dihate bikişandin. Weha vê rewşa hanê di derbasbûna heyaman de li nik Miletê Kurd de "Canekî liberxwedanê" date biafirandin, ku ew hêjî tanî vî heyamê hanê jî wî dide bihilgirtin, ku ew wî ji rewanî û leşkerî ji bona guhertina cenga liberxwedanê ji bona cenga hêrîşê li ser erdê Hêrîşvan de dide bixistin.

Wehajî gerjî me ji xwe re talanîyên Miletên di heyamên kevnar de li alîyekî de dane bivehiştin, Miletê Kurd ji diyarên xwe ji bona diyarên din ne hatîye biçûyîn, ji bil di pêla Musulmantîyê de di bin ala wê de û di bin navê wê de wê gava bi dehan hezar ji Suwarên wî di bin Rêberîya Fermandarên wî û Patîşahên Malbata Eyûbîyî Kurdî de ji bona rizgarîkirina xakê Surî, deşta nîlê, Qudsê û tanî Yemenê, Hicazê, Bengazî û Sûdanê ji talanîyên Xaçperestan dihatin birêketin. Ew pêla hanê bi xwe ve nala pêlekê di nava du kevan de têtê bidanîn, yanî ku ew di mêjûwa wî de bi xwe ve bi taybetî ve têtê biderkevtin. Herwehajî ligel Miletê me jî de hate bidîtin, ku Suwar û Serbazên wî jî di bin beyreqên Sultanên Binemala Osmanî û Şahînaşahê Îranê de di cengên wanî firehbûnê de yanjî yên lêdanê de dihatin bibirêketin. Ew ji wan cengan bê pişk û par bû, mîna ku ew li Ewropa de, hin heremên Asya û Afrîqya Jorî de hatin bikirin.

Weha dibe, ku em di koma van hoyên ciyografî, civakî, rewanî de û di taktîka liberxwedanê de hoyê poşandî bidin bidîtin, ya ku Miletê Kurd ji bona pêkanîna Dewleteke taybetîyî ji bona xwe daye bitawîkirin -Ji bil Dewletên Derebegî pêve, yên ku ew li Kurdistan yanjî li dorhêla wê de di sedsalên dehan de ji bal Binemalên Zaroyên Hesnewî û Zaroyên Merwanî- Dostik, Zaroyên Rewend -û ne Ruwad-, Zaroyên Şedadî, herwehajî Binemala Xorşîdî û Binemala Fezlewî, bi serdejî ve Mîrneşînîyên din jî di dawîya pêla Derbegyê de hatin bipêkhatin.

Wê hingava ku têtê bigotin, ku Miletê me ji cengê ji bil taktîka liberxwedanê pêve nade binaskirin û ew rengên cenga hêrîşî nade bizanîn. Evaya bi xwe jî ve nade

biderxistin, ku em sitrafîciya leşkerî nadin bizanîn, ya ku ew ji bona danîna neqşa cengê û rengên wê û civandina di navbera liberxwedanê û hêrîşê de piştî livenerandineke têrkirî ji bona hemû dayînên zînetê dide bipêwistkirin.

Belê pir di vî barê hanê jî de di sedsalê bîstan jî de ne hatîye biguhertin. Weha hemû cengên, ku Miletê me di nava wan de hatîye bidîtin û hêjî tanî nehajî ew di nava wan de tete bidîtin, ew bi xwe ve bi cengên liberxwedanê ve têtin biderkevtin, hegerjî ew li ser şeweyên cenga anîyê jî bêtin bidîtin, mîna ku ew di navbera du Dewletan de tete bikin. Weha evaya bi xwe jî yek carê ve di nava salên 1965-1975 de, nemaze di herdu salên wêyî dawî de hate bikirin, gava ku hêzên çekdarên şûreşa Mele Mustefa Berzanî li ber dol û tiraşên herema rizgarîkirî de li ser sînor de dida bidan, piştî ku hin çekên giran ji derve ji wan re hatin bigihaştin. Wehajî di pişt re jî şikestina mezin hate bidîtin, di wê roja ku hatina van çekan di mêjûwa 6. 3.1975 de hate bibirîn.

Cenga partîzanîyê yanî şeweyê cenga keleşîyê ew bi xwe ve bi nîzîktir ve ji bona karînen Miletê Kurd ji cenga anîyê) tete biligorkirin. Lêbelê jî ew bi xwe jî ve bi cengeke liberxwedanîyê ve tete biderkevtin; jiber ku tede her û her dest dawîşandin û vekîşandin li ser xakê Kurd de tete bikin. Wehajî dibe, ku tede şerên pir giran bêtin bidîtin, ku di nava wan de bi dehan ji Mirovan ve bêtin bikuştin û bi serdejî ve ziyanên zor mezintir li nik Hêrîşvan de bêtin bipeydakirin, lêbelê jî ne cîhana derve, na hêjîbêtir ne jî paytextên wan Dewletan, yên ku wan di nava xwe de Kurdistan dane biperçekirin, bi wan şeran ve didin bibihîstin.

Weha govend, semawend, aşxane û mêvan serayên wan tevde vekirî dimînin û di nava wan de Borcuwazîya Miletê Hemsî ji xwe re govend û dîlanan bilidardixînin, di dema ku tede bombe li ser gundên Kurd de têtin bibarandin û napalm çandinîyên wî, canewerên wî û pêrejî bi serdejî ve pir ji Xelkên wî ji Zarok û Pîran didin bisûtandin. Weha cenga pêşmergetîyê dibe, ku ew ji bona armancên cuda bête bikin,

lêbelê ew li Kurdistanê de ji bona nîv çarekirinan yanî Xwedmoxtarîyê tete biarmanckirin. Wisajî di nava wê jî de pêwendî di navbera Rêberîya Şûreşê û Serdarîya Borcuwazîya Dagîrkirî de bi hajbûnan û rawestandina teqekirinê ve dide bigihaştin. Evaya jî bi xwe jî ve bi şaşbûnekê ve tete biderkevtin, ku pir caran Şûreşa Êlûlê li Kurdistanê Îraqê de pê dihate bkevtin, wehajî niha jî careke din jî dibe, ku hêzeke şûreşê tede pê bête bikevtin, mîna ku deng jê tê û tete bigotin.

Her tevgereke rizgarîyî welatî ew bi xwe ve bi tevgereke şûreşgêrî ve tete biderkevtin. Weha ew di serûştîya xwe de û di nasîna xwe de bi hêrîşkirinê ve li ser Sitemkar de ji bona pozşikenandina wî, derkirina wî, guhertina rêstik û qanûnên wî û sitendina azadîyê dide bipêwistkirin. Weha heger Sitemkarê Zordar li ser de neyêyete bihêrîşkirin û hustê wî neyêete bikurtkirin, dê ew her û her di xweşîya setemkarîya xwe de li ser Kursîya serdarîkirina xwe de bête birûniştin û ew dê bi lédana pistên Zaroyên Milet ve bi qamçîyên xwe ve bêtin bişahîkirin. Weha bi vî rengî ve hîç tiştek niye, ku jêre bi Şûreşa liberxwedanêv bête bigotin. Liberxwedana li ber xwe de ew bi xwe ve bi mafeyekî ji mafeyên bingehîyî

pêşî Merovan ve têtê biderkevtin û weha ew bi xwe ve di xwe de hîç şûreşekê nayîne bipêkanîn.

Wehajî tevlivêjî cenga pêşmergetîyê bi xwe jî ve, mîna ku ew li Kurdistanê de têtê bikin, dagirtina bi dehan hezar ji Şervanên bi rêxisti ve ligel jî de jimareke pir ji yên ne rêxistî dide bidivakirin. Herwehajî pêrejî çekkirina wan, girawkirina teqemenîyê, anîna xwarinê û cil û bergan ji bona wan, girawkirina jîyana malên wan, nemaze ji yên Kuştîyên wan, ligel jî ji bona jimareke mezinî ji bil Şervanan jî ew dide bidivakirin. Evaya jî tev de bi hev re sermiyanekî pir gewre dide biniyazmendîkirin. Vê jî, mîna ku pir caran ew hatîye bikin, Rêberîya Tevgerê ji bona kutana hin Derîyên Derve ji bona daxwazkirina yarmetîyê ji wan dayite bineçarîkirin. Weha heger ku tevger ji bona Xwedmoxtarîyê bide biarmanckirin, wetov dibe, ku Derîyê Derveyî kutayî bi hin yarmetîyan ve merdbûna xwe bide biderxistin. Ev merdbûna hanê jî ne jiber hezkirina wî û piştgirtina wî ji bona tevgerê têtê bikin, lêbelê ji bona ew pê ziyane bi wê Dewletê ve bide bixistin, ya ku jê Xwedmoxtarî têtê bidaxwazkirin. Weha dibe, ku ev merdbûna hanê tanî demekê bête bidirêjkirin û di pişt re ew bête bibirîn.

Weha bi vî rengî ve rêberî girtîyê derdên xweyî darayî û pirsîyarîya peydakirina çek û teqemenîyê û girtîyê canê liberxwedanê têtê bihiştin.

Tev li vê tevî jî de cenga liberxwedanê dem di ser re hatîye biderbaskirin - û ez wê bi Cenga Bavpîran didim binavkirin -. Weha dijwarîya wê li ser Miletê me de ji dawîya cenga cîhanî duwem de hatîye bibêtirkirin û dê

dijwarîyên wê roj bi roj ve jiber çekên dujehîyî nuh bêtin bibêtkirin, yê ku Dewletên Gewreyî çêkirinê bi wan ve didin bibazirganîkirin û ew wan ji bona Borcuwazîya Regezperestîyî serdarîkirî ji bona wan Dewletên, yê ku wan Kurdistan di nava xwe de dane biparvekirin, didin bifiroştin. Weha heger Miletê me xwe bes û bi tenê xwe ve li ser Cenga Bavpîran de bide bihiştin, dê ew wê bide bidûrandin, hegerjî çijî şeweyên wê jî di Cenga Keleşiyê de têtin binavînkirin.

Weha nema bi durustî ve têtê biderketin, ku em ji bona Miletê xweyî mêrxas, yê ku ew di serûştîya xwe de bi gorîkirina mal û canê xwe ve têtê binîşankirin, ji bona ketina cengekek wisa bidin bibangkirin, ku di dawîya wê de destan ji bona wî û wêrankirina welatê wî bi agir û hesin ve têtê têtê bidîtin û di pişt re jî pê barkirina bi darê zorê ve û jê re koletî têtê têtê bidîtin, piştî ku ew di qonaxa "Keleha Dorlêgirtinê" de têtê biderbaskirin. Herwehaji bêtirbûna newekhevîyê di çek, mal, teqemenîyê de û bi bê dengbûna dereveyî Navdewletan de li qazanca Sitemkar de li ser me de bi remankirinê ve dide bidivakirin, ku em sitratîcîyeke xebatêyî nuh bidin bidanîn, ya ku ew rastîya Kurdistanê, rastîya Dewletên, yê ku ew wê dagîrdikin, û dorhêla rojhilatê û cîhanê dide biberçavkirin.

Weha di vê sitratîcîya hanê de têtê bimerckirin, ku ew bi sitratîcîyeke hêrîşkirinê ve bête biderkevtin; jiber her şûreşek, heger ku ew çî ji bona rizgarîkirina welatî yanjî civakî bide biarmanckirin, bes û bi tenha xwe ve ew bi hêrîşî ve têtê biderkevtin. Ew hêrîşa xwe bi ser bingehên Sitemkarîyê, Zordarîyê û Kolonyalîyê ve dide bikişandin.

Lêbelê sitratîciya hêrîşiyê ew bi xwe ve nebes yanjî hêjî rastir nebes bi tenê ve jê ya sipahiyê dide biderxistin. lêbelê şûreş bi liberketina sipahî ve divê bes û bi tenha xwe ve ew di qonaxên xebatêyî dawî de û bi reng û şeweyên pê bi pê ve li gora karînen heyî û armancên jêre nîşankirî bête bikin.

Weha sitratîciya hêrîşê bi xwe jî ve ew bi şûreşekê ve tête biderkevtin, ku divê ew di pêşî de di serê me de bête bikin û bi me ve bide neçarîkirin, ku em jê hişê Cenga Bavîran, canê Keleha Dorlêgirtî û Hestkirina bi Şermezariyê, na hêjbêtir bi Tawanbariyê ve, heger ku bes bi serê xwe ve em remanê ji bona rizgarîkirina Netewê xwe û sitendina mafeyên xwe bidin bikin, bidin birakirin. Wehajî ji aliyekî din jî de ev sitratîciya hanê jî bi girêdana "Hêrîşê" ve di pêşî de li ser warê remanê, mafeyî, rêxistinê û ramiyarî de li ser me de dide bidivakirin. Herwehajî di pişt re jî şeweyên weha bidin bipiştgirtin, yê ku Merov dikare wan bi "Mîna Sipahiyê" ve bide binavkirin, ligel jî de di wê hingavê de bi xwe jî ve li ser hêrîşên ragiyandinê û pêrabûnêndDiplomasî di nava Desteyên Navdewlî de û li hundurê jî de bête bigirêdan, da ku biryareyeke cîhanî ji bona kara pirsiyariyê bête biafirandin.

Weha bes û bi tenha ve piştî gihandina vê mebista hanê Şeweyên Sipahiyî Şûreşgêrî pişt bi wan ve tête bidan û pê bi pê ve li gora sitratîciyeke giştî li ser wan de tête biçûyîn. Wehajî û jibervêjî ev letê hanê, yê ku jê beşê dawî tête bipêkhatin, "Bi Şeweyên Xebatê" ve û ne bi "Sitratîciya Sipahî" hate binavkirin. Ev şeweyên hanê pêwistî bi xewendekariyeke giştî ve û bi rêxistineke zor bi rêk û pêk ve dide bikin, ku ew tevaya dayînan li ber çav

de dide bidanîn û bi hûr û kûrî ve li encamê her şêweyekî berî pişpêdanê û likarxistina destikên wî de ew lê dide bivenerandin. Wehajî niha jî vaye ez jî hin ji van şêweyan ji bona nimûne û ji bona têrkirî li gora danînekê de li ser pêşekîyê de li ser karîne de didimbi rêzkerin, bi têgihîştinekê ve ku her şêweyekî hatî ji bona yê berî xwe ji şêweyan bi xwe ve bi ser ve dide bivekerin. Bi vî rengî ve divê çûyîn li ser de bête bikerin, da ku gewdêyê xebatê li pê hev de bête bigewrekerin û karînen metiryalî û rewanî yên ji bona wê pêwîst roj bi roj ve di warên hundurû û derveyê de mîna hev jê re bêtin bipeyda kirin.

1. Weha bi serê xwe ve danîna Yasa Mafeyên Netewê Kurd, mîna ya ku ew bigir hatîye bidanîn û dazanîna wêna di nava Desteyên Navdewlî de û Rojnameîyê de bi xwe ve ew dê bi "Hêrîşeke Remanî" ve û bi zor ve bi kêr ve bête biderkevtin, ku ew dê bikaribe mîrxasîya Miletê me bide biberzkerin, gava tê dê bide bilidarxistin û mêranîyên Stemkaran dê bidin bilawazkerin û çavên tevaya gêtîyê li ser rastîya pirsîyarîya Kurd de dê bide bivekerin.

2. Lêbelê pêkanîna dam û destgehê Şûreşê yanî Berê yaxud

Sazmendîya Rizgarîkirina Kurdistan yanjî di bin navekî din jî de mîna wê û dazinana wêna di nav Desteyên Navdewlî de û li Hundurû de, ku dam û destgeh tevaya hêzên Miletê Kurd yên Demokrasî ji bona birêxistina xebatê û destpêkirina pê li pênavê rizgarîkirina Netewê Kurd de û ji bona pêrabûna Miletê Kurd bi mafeyê xwe ve di Çarenûsa xwe de dide bikomkirin, evaya bi xwe jî ve dê "Hêrîşeke Remanîyî" pir bi kêr ve bête bidîtin. Na hêjbêtir bi serê xwe ve, hingava ku em dam û destgehan didin bipêkanîn û pê em didin bidazanîn, "weha em ji pêşî de ji xwe re nivê şer didin biqazanckirin". Weha li ser hustuwê dam û Destgehên pirsîyarîya rêxistina gavên xebatê û girawkirina destikên pêwist jêre tete bikevtin.

3. Xweser bi cenga partîzanîyî bajarî yanî bes û bi tenha ve cenga nava bajaran tete bidestpêkirin, bi mercekî ve ku ew di derveyê Kurdistanê de û di nava Dewletên parvekirinên wê jî de bête bivêxistin û girêdana wê li ser paytextên van Dewletan û hin ji bajarên wanî gewre de bête bikin. Armanc ji vî şeweyê hanê bi xwe ve lêdana

Serdarê Stemkar di cihê serdarîkirina wîzaretên wî de, di îzgehên wî de, di pêkhatinên wîyî abûrî û sipahî de û ji wan jî pêkhatinên neftî û lûlê wan de, di firînxanên wî de, di benderên wî de di îstgehên kehrebên wî de û di rêyên çûn û hatinên wî de tete birin. Weha ji bona pêrabûna bi vê xebata hanêyî giring ve fêrkin û likarxistina nêzîka bîst Qolên Pêşmerge têtin bitêrkin, ku her Qolek jimara wan jî bîst Pêşmerge jîr, şehreza û mêrxas bêtir nayête bikin. Her qolek ji wan qolan jî hevdû bi carekê ve azadin û her yek ji wan bi Rêberîya Spahîyî Siyasîyî Giştî ve tete bigirêdan. Evaya bêtir ji tevaya 400 Pêşmerge pêve nade bipêwistkin û bi ser wan jî ve nivê wê jimarê jî ji Xelkên Alîkarên bêçek têtin biservekin.

Weha divê nuhkin û vegerandina pêkanîna van Qolan di dema ziyan pêketinê de û guhertina di nava wan de ji bona bînvekirina wanên, yê ku xebata wan hatîye bidirêjkin, bête bikin. Weha dibe, ku ev xebta hanê hin ji salan bête bidirêjkin.

4. divê Cenga Partîzanîyî

Bajarî dijî pêkhatinên Dewletên Borcuwazîyên Kolonyalgerên Kurdistan bête bikirin, ji yên ku ew li cîhane derve û ji wan jî li Cîhana Siyem, Ewropa û Cihên din de têtin bidîtin. Di xebata Qolên Pêşmerge de di hundurû û derve de ji ziyanpêketina bi Xelkên bê çek ji Zaroyên Miletên dorhêlê yanjî Miletên din ve divê bête bivegirtin, ev jî li gora reweşta rojhilat, mêrxasîyê û mirovanîyê de têtê bikirin, ya ku Miletê me bi wan ve bi serfirazî vê têtê biderkevtin.

5. Di heman kat jî de divê bi xwe jî ve girêdan li ser pêrabûnên êşkere de ji bona xebata Miletê me di rojname û îzgehan de li derveyî welêt de û di îzgehên hundurû de yên tevgerê de bêtin bikirin. Herwehajî divê her pêrabûneke Pêşmergeyê li ser de bête bimorkirin û hoyên wê û armancên xebatê bêtin bidiyarkirin.

6. Alîkarîyên Rêxistinên Demokrasî yên Çînîyên Kargerî yên Miletên dorhêlê dikarin bêtin wbiêrgirtin, heger ku ew bi pêrûwê tevgera Kurd têtin birûniştin û ew pêwendîyên xwe ligel wê de di rêya

dam û destgehê ramyarî de û ne di rêya Qolên Pêşmerge de didin bigirêdan. Herwehaji hegerji van rêxistinan ji xwestin, ew dikarin di vê xebata hanê de bi rengekî rêxistîyî ser bi xwe ve bêtin bibeşdarîlirin.

7. Dadgeheke Şûreşgêrî Kurdî di nava dam û destgehê ramyarî de tête bipêkhatin. Ew fermanên xwe li ser wan Kesên tawankar de ji Serdar û Rêberan der mafeyê Miletê Kurd de û der mafeyê Kesên wî de, herwehaji li ser wan Kurdên Xinêz ji de dide biderxistin. Ev fermanên hanê û hoyên wan piştî bicihanîna wan têtin bîşkerekirin. Ev fermanên hanê li ser Mafeyên Mirov têtin bîngêhkirin, yê ku ew ji bal Yekgirtina Netewan de hatine biyasakirin.

8. Dirav ji bal Zaroyên Miletê Kurd li Kurdistan de , ji nava Dewletan û ji Barkirvanan û ji her yekî li gora tuwana wî de, herwehaji ew di dema pêwîst ji de bi darê zorê ve tête bîkomkirin. Ev ji ji bal destgehekî taybetî de tête bîkîrin, ku hîç pêwendîyên wî ligel Qolên Pêşmerge de nayête bîderkevîtin.

Divê di xerckirina diravî de çavtengî bête bidîtin û çavfirehbûn têde û nemaze di çûyînên derveyî de divê bêtin biqedexekin. Alîkarîyên Diravîyî Mirovanî dikarin bêtin biwergirtin, bi mercekî ve ku ew tu kêran li ser armancên tevgera Kurd û ne jî li ser çûna wê de dikarin bidin bikirin, bi mercekî ku ew ne ji nava wan Dewletan tên, yê Ku wan di nava xwe de Kurdistan dane biparvekirin.

9. Pêkanîna pêwendiyên dostanîyê di navbera tevgera Kurd û Partî û tevgerên Bêgane de, yê ku ew bi Demokrasîyê û bi Mafeyên Mirov û Miletan ve didin bibawerkin.

10. Li ser destgehê ramyî de divê, ku ew li derveyê welêt de di hemû civîn, kongire û civînên salane de bête bibeşdarkirin, yê ku ew ji bal Sazmendîyên Navdewletan de têtin bikirin. Weha divê ji Sazmendîyên ne Serdarî û di pişt re jî ligel Sazmendîyên Netewên Yekgirtî de, yê ku ew bi Encûmena Mafeyên Mirov ve têtin bigirêdan, bête bidestpêkin. Wehajî ligeljî de li ser wî de divê, ku ew di kongirên

Partîyên Demokrasî û Dost de û di civînên Zanistî de, yên ku ji bal hin Zanistgehan yanjî ji bal Pêkhatinên Mirovanîyê de têtin bigirtin, bête bibeşdarkirin. Wehajî li ser wî de divê, ku ew Pirsîyarîya Kurdîyî Rizgarîkirinê di nava van Desteyan tevan de bide biraxistin û ji wan biryarîyan ji bona alîkarîyê û piştgirtinê ligel Miletê Kurd de di xabata wî de li pênavê pêrabûna wî de ji bona mafeyê wî di Çarenûsa wî de bide biwergirtin.

11. Wê hingava tevgera rizgarîkirina Kurd bi hemû wan şeweyên çuyî ve bikaribe bête birabûn, ku ew biryareyeke Cîhanîyî Giştîyî diyar û hîmkirî ji bona piştgirtina mafeyê Miletê Kurd di Çarenûsa wî de û di rizgarîkirina wîyî welatî de bide biafirandin, wehajî pê jî dergehên piştgirtina Navnetewî û Mirovanîyê bi hev re jêre bêtin bivekirin. Weha bes û bi tenha ve di vê hingava hanê de tevger li Kurdistanê de bi xwe ve di kare bi şeweyê Cenga Pêşmergetîyê bide bidestpêkirin.

12. Li ser tevgera rizgarîkirina Kurd de divê, ku ew ji bona

vekirina Cenga Pêşmergetîyê li Kurdistanê de di dema pêwîst de, berî ku mercê di deqa 11. hatî de bête bicihanîn, li kar be. Ev jî di wê çaxê de tete bidîtin, gava ku Dewletek yanjî ew Dewletên, yên ku wan Kurdistan di nava xwe de dane biparvekirin, şer li Kurdistanê de bi xwe ve li ser Miletê Kurd de ew bidin bivêxistin.

13. Divê bi Cenga Pêşmergetîyê ve li Kurdistanê de di jimarekê de ji hereman di yek demê de bête bidadan. Ew heremên hanê jî ne bes tenê jiber xurtbûna liberxwedana wan têtin bihelbijartin, lêbelê jî ew jiber giringbûna wanî sitratîcî, abûrî û jiber cihê wanî ciyografî jî ji pêwendiyên çûn û hatinê, dan û sitendinên -Logistîkî- têtin bineqandin. Weha destpêkirina Cenga Pêşmergetîyê li ser çûna şeweyên berê de dide bipêwîstkirin, na hêjbêtir ew wan dide bipircarkirin.

14. Tevgera kurd di dema destpêkirina Cenga Pêşmergetîyê de li Kurdistanê de dide bikarkirin, ku ew Tevgerên Demokrasî, yên

Kargerî û yên Şûreşgêrî ji yên Miletên dorhêlê pê bide biliberxistin, ku ew jî dest bi xebata xweyî şûreşgêrî ve li heremên xwe de bidin bikin û ew wê li wir de bidin bipircarkirin, da ew mafeyên xwe bidin bisitandin û piştgirtina xwe ligel Miletê Kurd de bidin biderxistin.

15. Di heman kat jî de bizava Kurd ji bona alîkarîya Miletên û Milîbûnên dinî stemkêş li Îranê de dide bikarkirin, da ku ew xwe bi şûreşgêrî ve bidin birêxistin û ew li pênavê mafeyên xwe de bidin bixebatkin.

16. Belê Cenga Pêşmergetîyê ji bona tevaya Kurdistanê li gora pêwistîyê û karînê de divê bête bikin.

17. Cenga Pêşmergetîyê ji bona Cenga Anîyê di heremeke nîşankirî de nayête biguhertin, her ger ku jêre tevaya mercên pêwist li ser ronahîya serpêhatîyên Miletê Kurd de ji diravîyê, çek û teqemenîyê, yên ku nayên bibirin, neyêtin bitêrkirin.

18. Hingava tevgera Kurd

perçakî ji Kurdistanê xwedan giringbûneke sitratîcîyî pêwîst bide biazadkirin û ew dikare wî bide biparastin, wê çaxê ew dikare pêkanîna Dewleteke Demokrasiyî Kurdîyî katî nala şêweyekî siyasîyî hêrîşî di xebatê de bide bidazanîn. Weha ji bona vê gava hanê divê hin mercên nala pêrûniştina hin ji Dewletan û tevgerên welatîyî demokrasîyî din pê bêtin bipeydakirin.

Weha wekû Ceneral Şarl Dîgol carekê dayite bigotin: "Dem di ser wî Miletî re nayête biderbaskirin, yê ku ew hêza tevgera xwe bi Xortên nuhatî ve dide binuhkirin".

Paşgotin

Xwendevanên Hêja!

va ez vê gotara Kak Ismet li ber destên we didim bidanîn. Ev gotara hanê bi xwe ve li gora bîr û bawerîya min de cihekî wêyî pîrî bilind, dûrbîn, giring û hêjbêtir pêwîst di tevaya xebata me de tete biderketin. Ew ronahîyeke giştîyî givatşî li ser tevgera me de di seranserîya mêjûwa me de dide biavêtin. Bîr û bawerîyên pîr giring û bi nerx ve di vê gotara hanê de têt bidîtin. Welatperwerên Kurd bivên yanjî nevên dê ew her û her bi wan bîr û bawerîyan ve bêtin birûkirin. Em tev dûr yanjî nêzîk dizanin, ku pîrsa Çarenûsê ji bona Netewê kurd û bicihanîna wêna tevaya xebata Miletê Kurd li ser de tete bigerandin.

Kak Ismet ev pîrsiyarîya hanê bi hozanîyeke pîr mezin û zanebûn û hêjbêtir rastir ve ji bona Xwendevanan daye biraxistin. Herwehaji şeweyê xebatê ji bona gihandîna armanca serxwebûnê ji bona Miletê Kurdistan weha diyar li ser bingehên serpêhatîyên Miletên din de daye bixuyanîkirin.

Wehajî wî rast û durust xebata Gelê Kurd ji bona Xwedmuxtariyê daye biderxistin, ku ew nikare Miletê Kurdistanê ji bona Çarekirina Pirsiyariya wîyî Milî bide bigihandin.

Weha Xwendevan bi van pirsên hanê û yên din ve têtin beramberkirin, ku ew niha di serên pir ji Xebatvanên Kurdistanê de têtin bigerandin.

Bi taybetî ve di vê dema ku Serdariya îraqê welatê me dide bitalankirin û Xelkên wî û hemû Jîndarên din bi Bombên Kîmyayî dide bibarandin. Ev qonaxa hanêyî nuh bi darê zorê ve bi hinera pêşveçûa qanûnên jînê ve li ser me de dide bineçarkirin, ku Xwedmuxtarî di Encamê dawî de bi xwe ve ew ne bes tenê bi xewnê ve tête biderkevtin, na hêjbêtir ew bi xwe ve bi evsanê ve tête biderkevtin. Evaya yek rastîyê li pêşîya xebata me de dide bineçarkirin, ku divê li ser Miletê Kurd de bes û bi tenha ve ji bona Çarenûsa xwe û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ji bona tevaya Kurdistanê bide bixebatkirin.

Weha xebata wî bi kêmtirîn gorî û kurttirîn dem ve di serxwebûnê û yekkirina Kurdistanê de bi serketinê ve tête bitac û xelatkirin.

Ez ji Xwendevan û Rexnevanan hêvîdarim, ku ew bi çavekî mehrebanî ve li vê wergerandina hanê de bidin bitemaşekirin. Werger bi xwe jî ve dizane, bê çend kêmanîyên vê wergerandina hanê pirin. Tevlivêjî min xwest, ku ez vê gotara Kak Ismet bi zimanê zikmakî ve ji bona Xwendevanên Kurd ji zimanê Erebi bidim

biwergerandin³³.

Dr. M. S. Cuma

Berlin, Mahlsdorf, di 16. 12. 1988 de

Ez vê wergerandina kurmacî ji bona Heval û Dostê xweyî hêja Fewzî Esed didim bidîyarîkirin; jiber bi saya serê wî ve tevaya karên wergerandinên minî kurmacî hemû hatine birastkirin. Dr. Cuma

³³Ev karê hanê bi yarmetî û alîkarîya Fewzî Esed, Dr. Fewzî Resul, Mizgîn, M. A. Delawî û Dr. Ciwan Cuma hatîye bikirin. Ez dixwazim, li ser vê yarmetî û alîkarîya wan de ji dil û can sipasîya xwe ji bona wan bidim bipêşkeşkirin. Dr. Cuma